

**Dîrokî şarî Hewlêr**

Le nasine here konekan ke le paşmawey şaristaniyekan bo numune Someriyekan, Asuriyekan Babilîyekan ke bamam mawetewe pêş 2000 sal P.Z. nusrawete nawî şarî Hewlêr be Erbil derkewtuwe. Her waha be Urbilum yan Arbilam manay 4 xudawend be manayekîtir wate şiwênî Sirmonî ayînî û xuday eştar buwe.

Rûpel 7

**WÊJE**

**Çira pêncan**

Çira Pêncan, kurteçîroka Fewaz Evdî ye û di pêşbaziya Koma Xanî ya Çand û Wêjeyê de xelata duymîntiyê standiye. Encama pêşbaziye di 3'ê tîrmeha 1995'an de li Helebê diyar bûbû. Di vê pêşbaziya kurteçîrokan de Suut Kılıç xelata yekemîntiyê wergirtibû û me ew weşandibû. Niha jî em vê kurteçîrokê pêşkêşî dêhna we dikin.

Rûpel 12

**CIVAKÎ**

**Xwezî careke din jî hatibûna diziya min'**

Hinek kes hene diziyê ji xwe re dikin meslek. Hinek kes jî hene, ji bo ku zar û zêçên xwe têr bikin ji mecbûrî diziyê dikin. Îro li hinek bajarên Kurdistanê diziya ji mecbûrî dest pê kiriye. Hinek kes ji bo ku şîvekê bibin ji zarokên xwe re carinan diziyê dikin.


Rûpel 4

**DINYA**

**Konferans û foruma jinan**

Di destpêka konferansê de Sekreterê Giştî yê NY'ê Butros Galî wekheviya jin û mêran wekî gelemşeya bingehîn a sedsala 20'an bi nav kir. Serokê Çînê Ji-ang Zemin dîtina xwe bi gotineke pêşiyar a çînî anî zimên: "Jin nivê asmên in." Polîsên çînî jî nêrîna xwe li ser jinên ku beşdarî forumê bûne dîsa bi wê gotinê şîrove kirin: "Gelo hûn ji nivî asmên zêdetir dixwazin?"

Rûpel 5



## YILMAZ GÜNEY YEW DÛVSTÊRK BI

Can Yücel,  
Ahmet Soner û tayna  
hunerka gore:

● Ayê merdimanê ki qalî kerd, hema hema fikrê jîn pêrin: "Eki Yılmaz Güney weş bibînêse-zeredê yan zî teber di hêç ferq nêkeno-halê sînemada Tirkîya ino hewa berbat nêbiynê, hindasî bêxebat nêbiynê" bi. Çimkî Yılmaz Güney, hêç yew wext bêxebat nêvindertê, se kerdê kerdê, çiyê viraştê, kerdê; him zî bêimkane mandî...

● Yılmaz vono: "Maymi kirdasî ya, pîmi zaza yo." Ez vono qay ona hewawo ki şima bahs kenê anasar çiyana hindasî rind nêhewniyanynê.... Mi verê kurdey ra jey sero çekî nêzanaynê; eses mi ayê wexto hêç nêgoştarit ki kurdkî qalî kerd.

Rûpel 8-9

**Derdorên siyasî şerê di navbera PKK û PDK'ê de nîrxandin:**



## 'Ev ne şerê birakujiyê ye'

● Ne tenê PDK, hemû hêzên herêmî û amadekarên plana nû li hemberî vê êrîşa ARGK'ê şaş û metel man. PKK'ê bi vê kirina xwe da pejirandin ku vê rewşa nû baş fêm kiriye. Piştî Dublînê PDK lawaz bûbû, dîsa PKK bi vê êrîşê dixwaze îradeya gelê kurd bi Amerîkayê bide pejirandin.

Rûpel 2

Derdorên siyasî şerê di navbera PKK û PDK'ê de demirxandin.

# 'EV NE ŞERÊ BIRAKUJIYÊ YE'



Serokê PKK'ê yê Giştî Abdullah Öcalan, gelek caran di axaftinên xwe de eşkere kiribû ku PDK dev ji têkiliyên xwe yê bi Tirkiyê re bernede wê ev yek weki sedemê şer bê qebûlkirin.

Civîna Dublinê çareseriyêke nû anî rojevê. Di bin îradeya Amerîkayê de be jî, dewleta tirk jî di nav plana nû de cih digire. Her wiha bi qasî başûrê Kurdistanê, ev plan bakurê Kurdistanê jî eleqedar dike, lê bi tu awayî daxwazên gelê kurd li ber çavan nayê girtin.

**Ne tenê PDK hemû hêzên herêmî û amadekarên plana nû li hemberî vê êrişê ARGK'ê şaş û metel man. PKK'ê vê kirina xwe da pejirand ku vê rewşa nû baş fêm kiriye. Piştî Dublinê PDK lawaz bûbû, dîsa PKK bi vê êrişê dixwaze îradeya gelê kurd bi Amerîkayê bide pejirandin.**

Şerê ku di navbera PKK û PDK'ê de roja 26'ê gelawêjê rûda, rojeva siyasî ya hêzên herêmî û împeryalistan serûbin kir. Me jî li ser vê meseleyê lêpirsinek pêk anî. Kesên wekî Nivîskar, Rojnameger Faik Bulut, Rojnameger Ragıp Duran, PSK, Serokê PKDW'ê Yaşar Kaya, Berpirsê Weşana Rojnameya Rojê Mehmet Mutlu dîtin û ramanên xwe jî me re diyar kirin. Digel hewldan, me jî YNK, YNDK û DDP'a Stenbolê, bersiv nestandin.

Derdorên siyasî yê kurd li ser şer dîtinê cur bi cur pêşkêş dikin. Serokê Parlemantoya Kurdistanê ya li Derveyî Welat (PKDW) Yaşar Kaya, dide zanîn ku ew vî şerî wekî şerê birakujiyê nabîne. Kaya dibêje ku gelê kurd li Başûr ev 40 sal e gelek şehîdan dide, xwîna xwe dirijîne, lê îro li Başûr wisa bûye ku hemû deskeftiyên gel jî dest biçin. Serokê PKDW'ê livbaziya PKK'ê wekî gaziyeke jî bo yekitî û biratiyê li hemberî îxanetê bi nav dike. Yaşar Kaya diyar dike ku dewleta tirk tu carî nabe dostê kurdan û bi hevalbendîya Tirkiyeyê kurd xelas nabin. Her wiha Kaya mentiqê parastina sînoran jî çewt dibîne. Yaşar Kaya dibêje ku PDK'ê di dîrokê de her tim rê li ber azadix-

wazên Bakur girtiye, nehiştiye ew tişteki li dijî dewleta tirk bikin.

Li aliyê din Berpirsê weşanê yê rojnameya Rojê Mehmet Mutlu, vî şerî li dijî berjewendiyên gelê kurd dibîne. Mehmet Mutlu dibêje: "Her çiqas rexneyên PKK'ê yê li hemberî PDK'ê di cih de bin jî, divê rêxistinên kurd meseleyên xwe bi riya guftûgoyan çareser bikin." Mutlu dadixuyîne ku PKK'ê diviyabû di şûna şer de şirkatiya PDK û dewleta tirk teşhîr bikira. Berpirsê Weşanê yê Rojê Mutlu dixwaze ku ev şer yekser raweste.

Dîsa Partiya Sosyalîst a Kurdistanê (PSK) li ser vê meseleyê daxuyanek li ser vê meseleyê gihand me. Daxuyanî dide zanîn ku rayedarên vê partiyê bi şer xemgîn bûn. PSK pêkhatina lihevrûniştina Dublinê wekî rûdaneke baş û li gorî berjewendiyên gelê kurd dinirxîne. Di daxuyanîyê de wiha tê gotin: "Her çiqas aştî bi destê Amerîkayê pêk hatibe jî, dîsa jî baş e. Ji ber ku şerê PDK û YNK'ê di her alî de zirar gihandiye gelê me." PSK wekî sedema destavêtina Amerîkayê jî îdia dike ku ew dewlet naxwaze bereya li hemberî Sedam lawaz bibe. Li gorî daxuyanîya PSK'ê li vir berjewendiyên gelê

kurd û yê Amerîkayê li hev dikin û şerê PDK û PKK'ê wekî şerê birakujiyê bi nav dike. Tê xwestin ku ev şer raweste. Tê gotin ku ev şer tu carî rê li ber Kongreya Neteweyî venake.

Li ser şer, du pisporên mijarê Faik Bulut û Ragıp Duran bi çaveki din li meseleyê dinêrin. Rojnameger Ragıp Duran ku hîn nû jî Başûr vegeyriyaye, dibêje ku rayedarên PDK û YNK'ê bi devê xwe gotine: "Amadekariya civîna Dublinê Amerîkayê kiriyê, civîn wan li dar xistiye." Duran dide zanîn ku şerê PDK û YNK'ê nakokî di nav gel de jî çêkiriye û dubendî xistiye nava wan. Li gorî gotina Ragıp Duran, PDK'ê bi êrişê PKK'ê gelek şaşwaz bûye û hejiyaye. Tê gotin Dublin, Enqere, Zirveya Sisiyan, Hallbrook, Sedam giş

şaş bûne. Gotine: "Înisiyatîf di destê kê de ye?" Ragıp Duran diyar dike ku doza kurdî jî niha ve bûye mijara sereke û dibêje: "Niha mesele ev e; wê kî çawa wê çareser bike?"

Her wiha Faik Bulut balê dikişîne ser plana ku Amerîkayê bi Lihevrûniştina Dublinê anîn rojevê. Ew dide zanîn ku plan komara tirk a li ser herêmê, bi têkçûna operasyona artêşa tirk têk çûye. Di vê planê de jîholêrakirina PKK û YNK'ê hebû. Li gorî Bulut, plana Amerîkayê (Çareya gelê kurdî ya global) li ser pêkanîna federasyona ku bakur û başûrê Kurdistanê bihevine, ava bûye. Vê planê dest û pê li Berzaniyê ku dixwest bi piştgiriya Tirkiyê û Sedam hikûmeteke eşîrî ava bike, girê dane. Bi plana Amerîkayê YNK xurt

bû, li gorî plana Amerîkayê wê Hikûmeta Federalî merkezî bibe û bi vê yekê re jî xurt bibe. Faik Bulut diyar dike ku PKK'ê girîngiya Hikûmeta Federalî û lawazbûna PDK'ê ditiye, xwestiye di avabûna hikûmetê de bibe xwedî raye. Her wiha PKK'ê di plana Amerîkayê de leyistika li dijî xwe jî ditiye. Bulut dibêje ku li gorî planê divê PKK'ê jî herêmê bê derxistin, an jî lawaz bibe û bikeve bin kontrolê. Faik Bulut dide xuyakirin ku li gorî hinek çavkaniyan, Amerîka bi xwe dixwaze li PKK'ê bide, li hemberî vê yekê PKK'ê gotiye: "Ezê xwe bi darê zorê bi we bidim pejirandin. Hûn hêza min dizanin, hûn dîsa jî dixwazin min tasfiye bikin, lê hûn bêyî min nikarin meseleya kurdî hel bikin." SAMÎ BERBANG

## Li Çukurovayê Heftiya Aştiyê

Heftiya aştiyê li herêma Çukurovayê bi çalakiyên cur bi cur berde-wam, hate pîrozkirin. Gelê Çukurovayê çî tirk, çî kurd û çî jî ereb diyar dikin ku rojên wiha dibin sedema teqîna hêrsa aştxwaz û azadixwazan. Li bajarên Edeneyê, Mersînê û Antakyayê, amedekirina heftiya aştiya 1'ê rezberê dest pê kir.

Roja 1'ê rezberê jî bo heftiya aştiyê li HADEP'a Edene-yê civîneke çapemeniyê li dar ket. Êvarê jî li Tesîsên Lunaparkê çalakiyeke bi navê "Şahiye Aştiyê" çêbû. Hunermend Yavuz Top, hozan Bahoz (ji NÇM'ê), Koma Raperîn (NÇM), Koma Dengê Aza-

dî ji Halk Evi ya Edene-yê koma folklor û musikê, Feyzulah Eti û Şenay Aydın û Koma Semahê beşdarî şahiyê bûn. Di dema belavbûna gel de, gelek kes jî hêla polîsan ve hatin girtin.

Mitînga Mersînê roja 1'ê rezberê bi beşdariyeke xurt û bi çoşeke mezin dest pê kir. Paşê li ser navê partiyên rayadarên partiyên, axivîn. Serokê HADEP'a Mersînê Abdullah Dağ, Serokê KMM (IHD) Hamza Yılmaz, Serokê SIP'ê yê giştî Aydemir Güler, ji navenda Giştî ya BSP'ê Mustafa Yavuz û Serokê Egitim-Senê bal kişandin ser şerê kirêt û gotin di 11 salên dawî de 20 hezar hatine kuştin, êdî bes e,

pêwîst e ku meseleya kurdî li ser maseyê çareser bibe. Nêzî 5 hezar kes beşdarî mitîngê bûn. Ji NÇM'a Edene-yê Teatra Yekbûn kurteşanoyek bi navê AŞTÎ pêşkêş kirin. Koma Rewşen, Hozan Bahoz û Koma Folklorê Koma Raperîn dilê aştxwazan geş kirin. Beşdaran di dawîya xwepêşdanên de kevokên spî firandin.

Li Antakyayê jî 6 şaxên rêxistinên demokratîk jî bo vê rojê daxuyanîyek weşandin. Di daxuyanîyê de tê gotin ku, pêwîst e mirov ji bo domandina jiyaneke birûmet xwedî li aştiyê derveve. Roja 2'ê rezberê, Serokê Giştî yê HADEP'ê Murat Boz-

lak bi konvoyekê ku ji 400 Erebe yan pêk hatibû li navenda Tarsus û Mersînê geriya, paşê jî li HADEP'a Mersînê bi gel re civînek saz kir. Gel li ser cadeya Cumhuriyetê meşîyan û sloganên mîna "Bijî biratiya gelan", "Aştî vêga" "Şehîd namirin" avêtin. Piştî peyivîna rayadarên sazîyan, Serokê Giştî yê HADEP'ê Murat Bozlak û jina Mehmet Sincar, Cihan Sincar li ser otobosa partiyê bi çepik, tîlîlî û sloganên xurt derket hemberî girseyê gel. Murat Bozlak bal kişand ser şerê kirêt û rewşa gelê kurd. Bozlak got ku; "Tansu Çiller, naxwaze û nikare vî şerî bisekinîne, kesên ku vî şerî bisekinîn Ci-

han Sincar, Tomris Özden (Jina Albay Rıdvan Özden) û xwîşka Xebat e, bila serê wan sax be. Mitîng bi çalakî û xwepêşandanên NÇM'ê û gelek sazî û rêxistinên demokrat, şoreşger û welatparêz qediya. Di mitîngê de zêdebûna tîmên taybet, bal dikişand ser xwe.

Roja 6'ê mehê bi beşdariya kesên mîna A. Melik Firat, Akın Bırdal, Yılmaz Çamlıbel, Mustafa Çinkılıç, Murat Salmaner û Hayri Kozanoğlu panelek çêbû. 500 kesî li vê panelê temaşe kir, polîsan di panelê de dest danî ser 50 heb rojnameya Welatê Me. SALIHÊ KEVIRBIRÎ ERCAN DEWLEMEND

\* Li başûr per nasekine...



...KURTENÜÇE...

Hewldana rawestandina MED-TV dîsa têk çû

Di serdana Wezîrê Îngilistanê ê Karê Derve Malcolm Rifkind de jî rayedarên tirk jê rawestandina weşana MED-TV xwestin, wezîrê Îngiliz da zanîn ku ew ne karê wî ye û jî bo televîzyonan komisyonek serbixwe heye. Tirkîyê berê jî gelek caran jî bo rawestandina vê televîzyonê serî li rayedarên Îngiliz dabû.

Cerdevan li metropolan tevî operasyonan dibin

Cigirê Serokê Belediyeya Midyadê û Sercerdevan Nedîm û muxtarê gundê Zaxoranê (Başyurt) Kadri Dağ tevî polîsan li Zeytinburnu û Bağcılara Stenbolê avêtin ser malên welatparêzan. Ji Malbata Mehmet Alpaydın 7 kes ku bi eslê xwe jî gundê Bahwarê ne hatin girtin. Ji Malbata Doğanan ku jî gundê Zaxoran in jî Dr. Zeki, Ramazan, Zeki û Şerif Doğan hatin girtin.

IPI'yê kuştina

Safyettin Tepe protesto kir

Instîtuya Çapemeniyê ya Navneteweyî (IPI) bi tundî kuştina muxabîrê Yeni Politikayê Safyettin Tepe protesto kir. IPI'yê nameyek jî Serokwezîra Tirkîyê Tansu Çillerê re şand û jê xwest ku ew li ser kuştina Tepe bisekine û kujyarên wî bîn dîtin û cezakirin. Safyettin Tepe di 29'ê gelawêjê de bi destê polîsên Bi-

Diyanet nikare muftiyan bişîne Kurdistanê

Serokatiya Karê Diyanetê roja 5'ê rezberê li Enqereyê jî bo muftiyan semînerê li dar xist. Serokê Diyanetê M. Nuri Yılmaz da zanîn ku li gelek deverên Kurdistanê personelê diyanetê nîn e. Yılmaz daxuyand ku gelek karmendên diyanetê naçin Kurdistanê. Yılmaz, kesên ku naçin tehdît kirin û got: "Em dibînin hin kes naxwazin biçin herêmê. Kesê ku neçe wê herêmê xayîn e."

Konseya Ewrûpayê nûnerê xwe dişîne Tirkîye

Mebûsê Partiya Sosyalîst a Macarîstanê û Endamê Komisyona Siyasetê ya Parlemantoya Ewrûpayê Andreas Barsony wê di destpêka meha kewçêrê de were Tirkîyê û li ser guherîna Qanûna Bingehîn û rewşa Kurdistanê raporekê amade bike. Rapora Barsony wê di rêbendana 1996'an de lihevrûniştina Parlemantoya Ewrûpayê bê nîqaşkirin.

Govenda zarokên agir û zarokên behrê

Serê sibehê yek-semê bû. Di roja ku herkes diçû bêhnvedanê, zorekên welatê ku ziman lê hatiye qedexekirin û ku her roj bi dehan mirov lê tê kuştin ji bo aştiyê kuçe û kolan dagir kiribûn. Li ber belediyeya Kadiköyê li hev civiyan. Kurdên ku bi salan şer kiribûn, wê mesele didan: "Em dikarin şer bidomînin, bes em dixwazin ji bo aştiyê xebatê bikin." Ew kesên du du sê sê hatibûn, niha bûbûn bi hezaran kes û bi sloganên "Bes e şerê kirê re", "Bijî aştiya birûmet" ber bi Meydana Kadiköyê dest bi meşa xwe kirin. Li pêşiya hemû kesên bi timtêlên xwe yên netewe-



yî zarokên agir wêneyê Apê Mûsa û dayika Latife hildabûn. Dema beşdarên meşa HADEP'ê tevî slogana "Bijî biratiya

gelan" riya bi dirêjiya 3 km'yan di bin çavdêriya temaşevanên metelmayî de birin serî, êdî roj diqulibî. Agirê aştiyê gur bûbû, tevî piştgiya panzeran jî polîs ji xwepêşdana dîr sekinîn. Piştî gihîştina korteja HADEP'ê xwepêşdana Aştiyê, bi rawestîna jî bo giyana şehîdan dest pê kir. Pişt re li ser aştiyê staranên bi kurdî, lazî, tirkî û hwd. hatin gotin. Ji Keskên 90'î yê Alman Claudia Roth da zanîn ku hem bi arîkariya leşkerî ya dewleta alman ji bo komara tirk xemgîn dibe, hem jî li hemberî vê yekê hêrsa wê bilind dibe. Hemû kesên ku axivîn aşti xwestin. Dayikeke ku sê

zarokên xwe di şerde şehîd dane wekî sembola aştiyê derket hemberî gel. Wê gotinên dawîn ên M. Hayri Durmuş bîr anîn û got ku ew hê jî deyndarê gelê kurd e. Di axaftina xwe de wê got: "Ne bila dayikên gerîla, ne jî dayikên leşkeran bigirin." Piştî axaftina bi tirkî şewata dilê xwe bi zêmareke kurdî anî ziman. Li hemberî vê dilşewatê gelek kesên xwe ranegirtin û rondik ji çavê wan dibariyan. Zarokên agir û Zarokên bahrê leyistîkên osmanîyan serûbin kirin û jî bo aştiyê ketin govendê, horon leyistin. Tev bi hev re gotin: "Aştî a niha!" H. HÜSEYİN İNAN

Polîtîkaya 72 salan têk çû

Gengeşiyên li ser rapora TOBB'ê hê jî dewam dike. Roja 5'ê rezberê li Otela The Marmarayê bi beşdariya Prof. Doğu Ergil, Prof. Dr. Ersin Kalaycıoğlu, Prof. Dr. Nüflefer Göle, Doç. Dr. Ümit Cizre Sakalhoğlu panel li dar ket. Panel jî aliyê Weqfa Lêhûrbûnê Civakî û Aborî (TESEV) ve hate lidarxistin û jî aliyê Prof. Dr. Yılmaz Esmer ve hate îdarikirin. Wek temaşevan jî gelek rewşenbîr û karsazên

Wekî Halis Komili, İshak Alaton, Güler Sabancı, Serokê TESEV'ê Bülent Eczacıbaşı, Serokê İKV'ê Sedat Aloglu, Mebûsê ANAP'ê Bülent Akarcalı, Serokê Komeleya Rojnamegerên Tirkîyê Nail Güreli beşdar bûn. Piştî vekirina panelê bi axaftina Bülent Eczacıbaşı, amadekarê raporê Doğu Ergil dest bi axaftinê kir. Ergil got ku polîtîkaya dewleta tirk a 72 salan ku dixwaze neteweyêke nû

pêk bîne, têk çû û kurdan dev ji nasnameya xwe bernade. Li gorî gotina Ergil gelê kurd piştgiyêke mezin dide PKK'ê û wê wekî berdevkê xwe dibîne ji bo ku hinek dawxazên xwe bîne ziman. Siyatsetzan Ergil got ku nakokîya di navbera kurd û tirkan de gihîştîye radeya şerê hundirîn. Her wiha Doğu Ergil bal kişand ser gotinên jina Albayê ku li Stewrê hate kuştin û got: "Ew gotin cewherê 168 rûpelên ku

min nivisandine, dide." Li dû axaftina Ergil akademîsyenên din rapor jî aliyê akademîk nixand. Ji Zanîngeha Boğaziçi Prof. Dr. Ersin Kalaycıoğlu rexne li raporê girt û diyar kir ku qet şiklê xebateke akademîk li raporê nakeve. Lê jî eynî zanîngehê Nülüfer Göleyê pesna Ergil û xebata wî da. Wê got ku kurd dixwazin li Tirkîyê bi nasnameya xwe bijîn. DEM/ Welatê Me

# 'Xwezî careke din jî hatibûna dizîya min'

Navê 5 kesên ku di xaçepirsa hejmara 41'î de peyva veşarî **'FERHENGOK'** dîtine û kaseta Koma Çiya **"Dilana bê sînor"** qezenc kirine:

Sedik Akkurt  
Çerkezköy/Tekirdağ

Zeki Beyazıt  
Stenbol

Baran Berk Selçuk  
İskenderun

Cemil Bilgiç  
Edirne


M. Ali Alan  
Qoser/Mêrdîn

Hinek kes hene dizîyê ji xwe re dikin meslek. Hinek kes jî hene ji bo zar û zêçên xwe têr bikin ji mecbûrî dizîyê dikin.

Îro li henek bajarên Kurdistanê dizîya ji mecbûrî dest pê kiriye. Hinek kes jî bo ku şîvekê bibin ji zarokên xwe re carinan dizîyê dikin. Lê xwedî mal dibêjin; "Xwezî bi van dizan. Ev ne dizî ye. Ev kes mecbûr mane dizîyê dikin."

Beriya heftiyekê ez çûbûm Amedê. Çar aliyê Amedê bûne qîşlayên leşkerî. Ji aliyekî ve qada balafir û firokan, ji aliyekî ve hêzên leşkerî yên cendîrme, kumando û tim. Ketin û derketina Amedê di bin kontrolên polis û leşkeran de ye. Di nav bajêr de jî çiqas mirov gavekê biavêje, rastî van kesan dibe. Lê gel dîsa jî dijî û dibêjin; "Dijmin çiqas tengasî li ser me çêbike jî wê jiyana me bidome".

Ez li dikana hevalekî rûniştî bûm. Şêxmûs, di dikana xwe de pêşgîran difiroşe. Min pîrsa wan gundiyan ku koçber bûne



**Kurdên ku ji gundan tîn, xwe li derdorên bajarê Amedê digirin û li binê bedenê ji xwe re sitaran çêdikin.**

ji kir. Şêxmûs, got: "Rewşa wan îro gelekî ne xweş e. Ji aliyê aborî ve gelek di tengasiyê de ne piraniya wan emeletiyê dikin. Lê yên ku karê emeletiyê jî nabînin hene. Ew kesên ku karê nabînin carinan dizîyê dikin. Lê dizîya wan ne wek dizîtiyê ye".

Şêxmûs, dema ku bahsa dizîya wan kesan dikir jî pê re dikeniya. Min pîrsa vê kenê jê kir. Şêxmûs: "Li kuçeya ku ma-

la min lê ye marketek heye. Beriya çend rojan diz ketin marketê. Sibehê dema ku ez dihatim kar, rastî xwediyê marketê hatim. Xwediyê marketê bi ken hate pêşiya min ve. Ez şaş bûm. Tu carî tişteki wisa di navbera me de çênebû. Min jê re got: "Xêr e tu îro çima wisa bi kêf î?" Wî got: "Îşev hinek ketine dikana min. Lê ez nîzanim çî dizîne. Ez li şêkir dinêrim çend kilo jê kêmbûne."

Hinek jî birinc birine. Lê devê kaseyê venekirine. Min kilîda kaseyê neqefaltibû. Nêzîkî 5 milyon pere tê de hebû. Lê destê xwe nedabûn wan. Ref tijî ci-xare bûn destê xwe nedabûn wan jî. Eger ez li dikanê bûma û ev kes bihatana dikanê min, minê jî tiştê ku wan dizîne zêdetir bida wan."

Îro hinek jî van gundiyan jî bo ku êvarê şîvekê ji zarokên xwe re bibin, dizîyê dikin. Lê mirov nikare jî van kesan re bibêje dizî."

Şêxmûs digot: "Rewşa wan gundiyan ne xweş e. Lê dîsa jî li ber xwe didin û jiyana xwe didomînin."

Dewletê dema ev gundî koçber kirin, digotin wê ji birçînan werin bibin cerdevan. Lê gel digel hemû zîlm û zoriyê li ber xwe dide û jiyana xwe didomîne. Qîma xwe bi dizîyê tîne, bi cerdevaniyê nayine. Bes kesek dizîya wî nade rûyê wî. Gelê ku ji berê di bajêr de bûn wisa dibêjin; "Ew kesên ku dizîyê dikin, bêçare ne, ji bo vê yekê dizîyê dikin. Em dizîtiya wan nadin rûyê wan. Ew tiştê ku birine helal û xweşî wan be"

**HAYRETTİN ÇELİK**

**XAÇEPIRSA BIXELAT (41)**

1	2	3	4	5	6	7	8	9
A	S	T	E	N	G	İ	A	R
M	E	L	A	L	A	L	E	Ş
K	E	R	İ	S	Ö	R	M	
T	İ	B	N	İ	J	A	D	
A	Ş	M	A	R	F	I	R	O
E	L	İ	Ş	E	R			
A	R	A	G	O	N	B		
İ	M	K	A	N	İ			
A	F	A	T	S	E	R		

PEYVA VEŞARÎ → (F E R H E N G O K)

**XAÇEPIRSA BIXELAT (43)**

Zar	Nêçira masîyan	Mam	İrdum	Hogirt	1	E ku jî ris çêbûye
Hupermen-dek (wêne)	Wezîle	Nikel	Menluqeke mitolojîk	Aha		
	2		4			
Di avê de şîr			Çepne	Dîberê bej		
Xwê				Din		
		Eke, elan şaşkî zîmanê İndo-ewropî	7	Pîşivan		
				Li wir gerim dihenî		
Bazan	5		Bazîmanî		3	
Hidrojen			Qeş			
	Nazik nazanîn			Rengek	6	
	Darek			Herêmek li sûr		
Wekî			Di notayê de dema seknê			
Notayek						
	Rojek		Cînavkek			
	Enstrûmanek		Qey			
Lez		Bawerî			9	
Bajerekl Suudiyan						
	8		Beyreq			



**Xelata Xaçepirsê**



Kasetaya Nilüfer Akbal **"MIRO"**

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin me, em dinixînin. Xelat bi riya pişkê (kura) li 5 kesan tîn belavkirin. Xelata hejmara 43'an; kasetaya **Nilüfer Akbal "MIRO"** ye.

**Jêrenot:**

Ji bo ku bersiva we bê nîrxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.

**PEYVA VEŞARÎ** → **WELATÊ ME**

1 2 3 4 5 6 7 8 9

# Konferans û foruma jinan

Ev demeke dirêj e Konferansa 4'an a Jinên Dinyayê ya Neteweyên Yekbûyî (NY) û Foruma Rêxistinê Ne-hikûmetî ku li nêzikî cihê konferansê tê lidarxistin, dibe mijara niqas, gotûbêjan. Bi qasî mijara ku ev civîn li ser çêdibin, cihê ku lê konferans û forum çêdibe jî girîng e. Konferansa ku li peytexta Çînê Pekîne roja 4'ê rezberê dest pê kir, ji 10 salan carekê li welatekî çêdibe. Her wekî berê rêxistinên nehikûmetî qîma xwe bi konferansa NY'ê neanîn wan jî roja 31'ê gelawêjê hefteyekê berî konferansê li goşeyekî navçeya Huairou ku 50 km'yî ji Pekîne

dûr e, dest bi xebatên xwe kirin. Tiştên ku cih girîng dikin, nakokiyên di navbera Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê (DYA) de û helwesta rayedarên Çînê ya li hemberî hêzên dijber e. DYA ji ber sedemên siyasî mafên mirovan jî xwe re dike hincet û bi ser Çînê ve diçe, li aliyê din rayedarên çînî jî rê nadin nûnerên hinek komên dijber ku beşdarî civînan bibin û bi awayekî nexweş çavdêriya çalakîyan dikin. Hîn di destpêka forumê de polisên çînî dest danîn ser kasetên videoyê ku ji bo tesbîkirina tawanên hikûmeta Çînê ya li hemberî mirovên tibetî di forumê de

hatibû nîşandan. Dîsa rayedarên Çînê eşkere kirin ku ewê rê nedin tu çalakiyên li dijî rêveberiya Çînê. Tevî çavdêriya polisên çînî jî, nûnerên rêxistinên wekî Amnesty Intertinonalê (AI) ango Rêxistina Eftuyê ya Navneteweyî diyar kirin ku ewê li hemberî bînpêkirina mafên mirovan gavekê bi paş ve neavêjin.

Li gorî agahiyên ku ajansên nûçeyan didin wê nêzî 30 hezar nûnerên hikûmetan beşdarî konferansa NY'ê bibin, her wiha wê 25 hezar kes jî di foruma rêxistinên nehikûmetî de cih bigirin.

Di destpêka konferansê de Sekreterê Giştî yê

NY'ê Butros Galî wekhevîya jin û mêran wekî gelemşeya bîngehîn a sedsala 20'an bi nav kir. Serokê Çînê Jiang Zemin dîtina xwe bi gotineke pêşiyar a çînî anî zimên: "Jin nivê asmên in." Polisên çînî jî nêrîna xwe li ser jinên ku beşdarî forumê bûne dîsa bi wê gotinê şirove kirin: "Gelo hûn jî nivê asmên zêdetir dixwazin?"

Tê gotin ku wê di herdu civînan de jî heman gelş û problem bîn guftûgokirin, bes awayê guftûgokirina mijarê diguhere. Mînak di forumê de jinên ku neheqî li wan hatiye kirin wê serpêhatiyên xwe tevî belgeyan pêşkêşî beşdaran bikin. Hemû kes dipejirînin ku jiyana jinan gelek dijwar e û çareserkirina problemên siyasî, civakî û çandî ne hêsan e, bes hinek feminîstên ku beşdarî konferansa NY'ê bûne hêvîdar in ku wê karibin hinek tiştan bi dest bixînin û ji yê radikal dixwazin ku dev ji livbaziyên tûj berdin da ku konferans bixirecîr biqede. Lê kesên ku rewşa konferans û civînan NY'ê yê berê dizanin, diyar dikin ku tevî hinek pêşketinan jî hevkeşeya di nava hêzên ku beşdar dibin de, rê nade tu destkeftiyên nû. Jixwe hinek problemên aborî wekî bêkari, kêmbûna îmkânên tenduristî û perwerdehiyê bi sistemê ve gi-



Betty Friedan a ku ji mêj ve di nava tevgera jinan de ye, dixwaze ku jin piştgirî bidin Konferansa NY'ê.

rêdayî ne, nûnerên fermî yê dewletan naxwazin tu guherînan bîngehîn bikin, dîsa hêzên kevneperest nahêlin ku edet û kevneşopên li ber azadiya jinan dibin asteng, jî holê rabin.

Li gorî konferansa amadeyî ya ku berî konferansa Pekîne li New Yorkê çêbû, mijarên wekî rawestandina her cure hingaftin û lédana li ser jin û sunetkirina jin, pîvana karên ku jin li mal dikin û di warê gihandina zarokan de parvekirina kar a jin û mêran di konferansê de

tên niqaşkirin û pişt re jî tiştên ku li ser lihevkerin çêbe, wê bibin biryar.

Ev konferans cara yekemîn di sala 1975'an de li Meksîkayê çêbûye. Niha gelek kes dipejirînin ku piraniya pêşketinên heyî bi xebata rêxistinên nehikûmetî çêbûne. Di destpêkê de piraniya beşdarên konferansê mêr bûne, jinên ku hebûne jî pîrek û sekreterên rayedarên dewletan bûne. Lewre jî derdora siyasî giringiyê mezî didin forumê jî.

Nûçeyên Derve



Endamên rêxistinên nehikûmetî li hemberî helwesta hikûmeta Çînê bêdeng namînin û bînpêkirina mafên mirovan protesto dikin.

## Polîtîkaya Amerîkayê ya alîkarî ji bo dewletên biyan

Serokê Amerîkayê Herry Truman di adara sala 1947'an de cara yekemîn 400 milyon dolar alîkariya leşkerî û aborî dide Yewnanistan û Tirkîyeyê. Ev destpêka polîtîkaya Amerîkayê ya alîkarî ji bo dewletên biyan bû. Amerîkayê dixwest bi ve alîkariyê li dijî pêşketina Sovyetê li Balkan û Rojhilata Navîn derkeve û alîkariya wan dewletên ku ji aliyê Sovyetê tî "êşandin û kotekiyê" dibînin, bike. Ji ve polîtîkayê re digotin "Containment-Politic" û bi navê Turman Doktrîn hatiye naskirin (Binêrin li Robert Packenham, Liberal America and the Third World. Political Development Ideas in Foreign Aid and Social Science, Princeton,

NJ, 1973). Ji ve demê heta niha hin bi hin alîkariya leşkerî ji bo Tirkîyeyê zêde dibû, piştî endametiya Tirkîyeyê ya NATO'yê, dewleta Tirkîyeyê bû yek ji wan dewletên cihanê ku herî zêde alîkariya leşkerî û aborî ji Amerîkayê distîne. (The U.S. Arms Control and Disarmament Agency report that from 1987-1991, the U.S. accounts for 77% of arms deliveries to Turkey.. Washington: U.S. Government printing Office, 1994, r. 132.). Li gorî rapora Ajansa Bêçekkirinê, di navbera salên 1987-1991'î de %77 çekên ku Tirkîyeyê ji derve kirîne, ji Amerîkayê standine.

Di navbera dewleta Amerîka û Tirkîyeyê de peymanana bi navê DECA (Defence and Economic Cooperatinon Agreement) ango Peymana Parêzî û Aborî heye û li gorî ve peymanê dewleta Amerîkayê divê teknîka leşkerî yê agahdarî û ragihandinê bide Tirkîyeyê. Di wan salên dawîn de (1986-1995) dewleta Amerîkayê 5.1 milyar dolar ji bo leşkeriyê daye Tirkîyeyê. Piştî evqas îhlalkirina mafên mirovan êdî Kongreya Amerîkayê jî nikare çavên xwe bigire û lewre jî di sala 1994'an de diravên alîkariyê ji bo Tirkîyeyê pir kêm be jî, qut kir. Piştî êrîşkirin û vegirtina

nivê Qibrîsê di sala 1974'an de ev gavekî yekemîn û pêwîst e ku ji aliyê Kongreya Amerîkayê ve hatiye avêtin. Tevî ku Amerîka dizane li Tirkîyeyê mafên mirovan nemaye, dîsa jî dixwaze bombeyên Cluster CMU-87 bide dewleta Tirkîyeyê. Ev bombe gava diteqe ji nava wê dîsa 202 bombeyên biçûk nêzikî 100 metroyî belav dibin û dîsa diteqin. Ev bombe Cluster ji bo serhildana an jî xwepêşdanên gel hatine çêkirin. Ev tê ve encamê ku dewleta Amerîkayê bi zanebûn qirkirina li Kurdistanê dipejirîne (ji bo agahdariyên zêde binêrin li: "The section on

cluster bomb, the CBU-87 and use in the Gulf war are drawn from a paper prepared for the arms project by William M. Arkin," "the CBU-87 Combined Effects Munition, Elun 29, 1994" Li ser alîkariya leşkerî ji bo Amerîkayê wiha dibêje: "Di salên 1992 û 1993'an de dewleta Amerîkayê nêzikî 1500 tank, 500 erebeyên din yê cengê û 54 balafir dane dewleta Tirkîyeyê. Dewleta Amerîkayê evqas teknîkên cengê yê leşkerî dane Tirkîyeyê ku di wan du salên dawîn de ew ji leşkeriya dewleta Îngilîz zêdetir dibe xwediyê melzemeyên leşkerî. Ev jî rewşa cengê li Tirkîyeyê diyar dike.

DARA AZADÎ - WASHINGTON

FAL



**BERAN (21 Adar - 20 Avrêl)**

Rast e derfeteke baş ji destê we çû. Lê, bi dû tiştê derbasbûyî nekevin. Hûn çî bikin jî tiştê çûyî êdî nayê. Divê, hûn bi vê yekê jî xwe zehf neêşînin. Wekî Cervantes jî gotiye: "Ger deriyek we re girtin, wê deriyekî din vedibe."



**GA (21 Avrêl - 21 Gulan)**

Her tiştî mirov nikare bi serê xwe bike. Divê, mirov xwe fêrî xebata kolektîf bike. Bi xebateke tev bi hev re serketina her cure karî garantî ye. Gotina John Florio "Destek destekî din, her du dest jî rûyekî dişon" ji bîr nekin.



**CÊWÎ (22 Gulan - 21 Pûşper)**

Divê hûn pêşeroja xwe li ber çavan bigirin. Dev ji vê mesrefa zêde berdin. Ger hûn bi vî awayî dewam bikin, hûnê pişt re gelek poşman bibin. Poşmaniya dawiyê jî tê zanîn ku bi kêrî tiştêkî nayê. Hûn ji ku derê zirarê vegevin kar e.



**KEVJAL (22 Pûşper - 23 Tîrmeh)**

Azadî tiştêkî gelek xweş e. Ji bo azadiyê mirov dikare her tiştî bike. Tu carî dev ji azadiyê bernedin. Bes divê mirov naverokê wê baş bizanibe. Çî gotiye, Roland: "Ax azadî! Li ser navê te çî mirov têne kuştin."



**ŞÊR (24 Tîrmeh - 23 Gelawêj)**

Divê hûn zêdetir, bala xwe bidin ser xebata xwe. Lê ew tişt bi tenê ne bes e. Xebatên hevalên we dikin jî bi qasî xebata ku hûn dikin girîng e. Ev demek e têkiliyên we bi hevalên we re nebaş in. Bi vê qûşê hûn nagihîn Mûşê.



**SIMBIL (24 Gelawêj - 23 Rezber)**

Van rojan kêf kêfa we ye. Hûn her gav li derekê ne. Rast e, dema rewşa mirov xweş be û kêfa mirov li cih be, divê mirov ji jiyane tamê bigire. Lê divê mirov di rojên xweş de, rojên neexweş jî bifikire (Thomas Fuller)



**MÊZÎN (24 Rezber - 23 Kewçêr)**

Ji tu karî netirsîn, dema mirov bikeve nav karekî û pê dakeve, mirov bi ser dikeve. Tiştê girîng ew e ku mirov ji kar netirse û ji xwe bawer be. Dema mirov ji xwe bawer be, mirov çî bixwaze wê pêk bê.



**DÛPIŞK (24 Kewçêr - 22 Sermawez)**

Hinek bi aram bin. Lêzgîni di gelek kar û barî de zirarê dide mirov. Divê hûn xwe hîni bêhnfirehiyê bikin. Wa ye E.B. Browning jî daye zanîn ku, sebir, navekî hêzê ye din e. Hin kes çend buse li ber we danîne, bila haya we jê hebe.



**KEVAN (23 Sermawez - 21 Berfanbar)**

Divê hûn zêde qîmetê nedin malê dinyayê. Dema mirov zêde qîmet bidê, mirov ji hinek tiştan dûr dikeve. Gotina Carly ku dibêje: "Qîmeta pereyan xuya ye, lê carinan ew qîmet qet namîne, dadikeve binê sifirê."



**KARİK (22 Berfanbar - 20 Rêbendan)**

Hûn ji xwendina pirtûkan hez dikin. Pirtûk û kovaran distînin, lê ji tirsan li mala xwe nahêlin. Divê hûn pirtûk û kovarên xwe biparêzên û li cem xwe veşêrin. Wekî Çicero jî gotiye: "Maleke bêtirtûk mîna laşekî bêgiyan e ji bîr nekin."



**DEWLİK (21 Rêbendan - 11 Reşemî)**

Mirov dema di şaşiyekê de be û rastiye bibîne divê mirov dev ji şaşiyê berde. Parêzkariya karê şaş wê zirareke mezintir bigihîne mirov. Divê em ji bîr nekin ku tenê yên mirî û yên aqilê fikrên xwe naguherînin." (Lowell)



**MASÎ (20 Reşemî - 20 Adar)**

Di dewsa ku hûn rahêjin kaxizên qumarê de, hûn bizotekî bidin ser lepê xwe çêtir e. Agirê bizot lepê mirov, qumar mala mirov dişewitîne. "Qumar, zarokê hêrs û timayê, hevalê xerabiyê û bavê zerar û ziyane ye." (George Washington)



**Ger ewliya ji Cilîn be!**

Di navbera Mêrdîn û Amedê de bi navê 'Siltan Şêxmûs' ziyaretek heye. Li gora bîr û baweriya gelê herêmê, kesê ku kordunde be diçin vê ziyaretê, qurbanekê serjê dikin, tika ji Yezdanê dilovan dikin û peymanê didin ku lawek ji wan re bibe dê navê Siltan Şêxmûs (Şêxmûs) lê bikin. Şêxmûsê Enter û Mele Şêxmûsê Hesarî (Cegerxwîn) jî li ser vê peymanê bi nav bûne.

Di hilbijartinên 1987'an de, Serokê SHP'ê ye Qoserê (Kiziltepe) Senanîk Önen bû. Senanîk Surgicî ye û ji gundê Cilînê ye. Rojekê Mele Munîr tê seredana partiyê, silavê li civatê dike, lê Senanîk ji ber wî ranabe û guh nadeyê, bi tiştêkî mijûl bûye. Dibe ku hay ji jê tune bûbê.

Mele Munîr jî xwe mezinek, rîsipyekî Qoserê didit. Ev rewşa Senanîk geleki pê nexweş tê, lê rasterasta jê re nabêje. "Çima tu ji ber min ranebûyî û te giramî nedaye min." Hêdîka qutiya titûnê ji berîka xwe derdixe, cixareya xwe dipêçe û wisa dibêje: "Heyamekê yekî Omerî kordunde bûye û radibe xwe li navê Siltan Şêxmûs digire. Di rê de lê dibe êvar û dadigere gundê Cilînê û wê şevêkê li malekê dibe mêvan. Piştî şivê ye mêvandar ji ye Omerî dipirse: "Pismamê delal, tu ji kuyî û te xêr e?" Yê mêvan: "Pismam, ezî Omerî me, bi xêr ezê herim ziyareta Siltan Şêxmûs, da Yezdanê Dilovan warê min hêşin bike, lawekî ji min re bibexşîne." Yê Cilînî: "Wele ev pir baş e. Yê ku xwe avê-

tiye bextê wî, vala venegeriyaye. Ewliyayekî avzel e, her kes diçe ber lingên wî. Biryara te li ser xêrê be. Ha, dibe ku tu nizanibî, Siltan Şêxmûs xizmê me ye. Yezdanê pak û dilovan me ji xêra wî bêpar neke."

Serê sibê ye omerî ji xew radibe û berê xwe dide mal û bi paş de vedigere. Yê Cilînî bi pey dikeve û jê re dibêje: "Pismam tu berevajî diçî, rîya ku diçe Siltan Şêxmûs ne ev e. Yê omerî vedigere ser û dibêje: Hişê min li serê min e. Ez vedigerim malê. Madem ku Siltan Şêxmûs xizmê we cilîniyan e, bi sê telaqê bêtîtu ku mala min mîrate jî here û ez kordunde jî bimînim ez naçim ber lingên wî û min lavayî ji wî nekîr. De bi xatirê te pismam."

**Î. OMERÎ**

**Jaro İsmet!**

Di salên 1940'an de, Dgava ku tirkên Bulgaristanê mişextî Tirkiyeyê dibin, dewlet li devera Amedê, li Bismil û derdorên wê, wan akincih dike. Wê hingê İsmet İnönü Serokkomar bûye. Piştî bicihbûna tirkên Bulgaristanê bi heyamekê, İsmet Paşa tê seredana wan û wisa ji wan re dibêje: "Hûn ji ber zordariya komunîstên bulgarî reviyân û hûn hatin ba me. Me jî, çî devera bi xêr û bêr hebû, me hûn li wir bicihkirin. Bi kurtayî, me erkê xwe ye nijadî li hemberî we pêk anî. Vêca, divê ji niha û pê de hûn jî bi kêrî dewleta xwe bîn. Ev xelkê li dor we, feqîran bi tirkî nizanin. Divê hûn alîkari-

ya wan bikin da ku fêrî tirkî bibin."

Piştî vê axaftinê bi 4-5 salan careke din İsmet Paşa tê seredana tirkên bulgarî û dîsa ji wan re dipêyive. Li dawiya peyva xwe ji wan re dibêje: "Erê cara din we sozek dabû min, we gotibû ku emê mirovên li derdora xwe fêrî zimanê tirkî bikin. Ka, we soza xwe anî çî?"

Tirkên bulgarî, li ser vê pîrsa İsmet Paşa wisa bersivê didin: "Em fêrî kurdî bûne, em fêrî kurdî bûne!.."

İsmet Paşa fotêra xwe dadixe ser çavên xwe û dibêje: "Baş e baş e. Mirov çiqas zimanan zanibe hewqas baş e..."

**GELÊRÎ**



# Dîrokî şarî Hewlêr

Le nasine here konekan ke le paşmawey şarîstaniyekan bo numune Sommeriyekan, Asuriyekan Babilîyekan ke bamam mawetewe pêş 2000 sal P.Z. nusrawete nawî şarî Hewlêr be Erbil derkewtuwe. Her waha be Urbilum yan Arbilam manay 4 xudawend be manayekîtîr wate şiwênî Sirmonî ayînî û xuday eştar buwe.



Le Kurdistan da gelek şarî mezin dîrokî Lyekgar konyan heye, bo nimune wek Amed, Hewlêr, Kerkuk û gelê bajêrîtir. Estaş lem beşe da be kurtir basî bajêrî Hewlêr ekeyin.

Le cografyaya here konî şarestanî mirowayetî şarî Hewlêr le zor serdem da basî lê kirawe, estaş be kurtî hez dekeyn le çend dêrêk da basî em şare bikayin.

Pêşekî awu û heway em şare le awu û heway deryaya naweraste. Şarekeş xoy kewtote nêwan her du zêy cewre û buçûk ke kewtote beşî başurî mezinî Kurdistan. Em şarê her le konewe nawban-

kî bewe der kirduwe ke be şiwênî hesanewey karwancî û baziganekan buwe ke le ewrupawe bere u Bexday konu Besra çun, le ber ewe pêşkewtnîkî zarî be xowe binîwe le serdeme cora u corekan. Le ber strajîyeke sere rê û lêj bunewe berew deştayî cige leweş nawbangî be gelê paşmawey kon heye ewîş Qelakey Hewlêre ke be dirêjayî mêju buwe be sengerî Parîstir hem û şarîstaniyekan, ke le qelaye fermanrewayîyan kirdu.

Le beşî bakurî em şare da rizeçiyakanî Sefîn û Pirmam, Xoyan nîşan deden ke berziyîkanyan 847 me ber ebiu ke le deştayî bastorewe bere bilendî xo


derdixen le beşî başurî kewtuwe. Her waha be Urbilum yan Arbilam manay 4 xudawend be manayekîtîr wate şiwênî Sirmonî ayînî û xuday eştar buwe. Le cêyekî trî nusrawekan be şiwênî xawen şiko (kîşan kilama) nau nrawe, bigre coreha şewey tir naunrawe. Ta ku hatinî sedey bistem (20) ke naunraw be Hewlêr nawbangî der kirdu we. Estaş yekeke le şare here mezinekanî Kurdistan û ke jimarey daniştuwanî pitir le milanêkey şiwênî mirî ramyarî û desolatî nawçey başurî Kurdistane peş serhel-daniş şiwênî encumenî teşrî û tenfîzi bu.

Le pertoke konekan çan bas krawe.

Le nasine here konekan ke le paşmawey şarîstaniyekan bo numune Sommeriyekan, Asuriyekan Babilîyekan ke bamam mawetewe pêş 2000 sal P.Z. nusrawete nawî şarî Hewlêr be Erbil der-

kewtuwe. Her waha be Urbilum yan Arbilam manay 4 xudawend be manayekîtîr wate şiwênî Sirmonî ayînî û xuday eştar buwe. Le cêyekî trî nusrawekan be şiwênî xawen şiko (kîşan kilama) nau nrawe, bigre coreha şewey tir naunrawe. Ta ku hatinî sedey bistem (20) ke naunraw be Hewlêr nawbangî der kirdu we. Estaş yekeke le şare here mezinekanî Kurdistan û ke jimarey daniştuwanî pitir le milanêkey şiwênî mirî ramyarî û desolatî nawçey başurî Kurdistane peş serhel-daniş şiwênî encumenî teşrî û tenfîzi bu.

DILÊR



Yên berî me çî, çawa dinivîsandin?

## Ji dîroka rojnamegeriya kurdî

Nivîsek ji hejmara 28. a Kovara Hawar  
Mêjû: 1941, 15'ê gulanê

### Navên kurd û kurdmanc û cihên Kurdistanê

Çima ji me re dibêjin kurmanç? Di zemenê tofana Nûh de, gava keştiya wî li ser çiyayê Cûdî (Cih di) yanî (çiyakî dî) rûniştiye kurmancan gotiye li cihêkî din rûniştiye. Bi erebî jê re gotine (Cûdî). Lê ev navekî kurmançî ye. Ji xwe (Nûh) jî (nih) an (nû) ye. Ji ber ko dinyaya jî nû ve ava kir. Gava Nûh û hevalê xwe (heştê) peya li ser çiyê ji keştiya xwe bi derketin, li pesara çiyayê Cûdî gundekî nû ava kirin. Jê ra dibêjin (Heştîyan). Ew gund îro jî ava ye.

Piştî ko însan pir bûn û zeman dirêj bû û nijad ji hev derketin û li rûyê zemînê belav bûn; kurd li warê bavê xwe man. Ji ber vê yekê hate gotin (kurd-man-li-ci-).

Di dora zeman û zaravan da (li) winda bû; û ev gotin kete şikilê (kurdmancî) û (kurdmanc); pêşdetir (d) jî ket û bû (kurmanç).

Herwekî navê Nemrûd (Nimroz) yanî (Nîvroj) e.

Ji xwe bajarê Cûdî (Şernex) e. Esilê vê gotinê jî (Şehrê-Nûh) an (Şehrê -nû) ye, kurmançîke xwerû; bi mana (Bajarê Nûh) an (Bajarê nû).

Gelek navên kurd û Kurdistanê hene ko bi vî awayî hatine guhartin. Ko Xwedê hez kir ezê pêşdetir hinekên din jî pêş çavên xwendevanên Hawarê bikim.

HIŞYAR

### Jin û bextiyariya malê

Gelek jin hene; bawer dikin ko rehetî û Gxweşiya malê bi pere û dewlemendiyê ye. Lê ne we ye. Seadet û bextiyarî ne ji dewlemendan bi tenê re ye. Xincikên belengazan hene ko seadet û bextiyarî, ji qesra dewlemenda çêtir û bêtir, tê de qerar digirin û bi rehetî cih dibin.

Carina seadet sadegî ye û bextiyarî pê rewşen û geş dibe. Sadegiya xwediya malê ew e ko bi xelkê dora xwe re mihirvan û dilovan bibe, piçûkan neêşine, bi mezinan re ji adetê der midarayê neke. Bi van wesfan xwediya malê dikare hejkirina xelkê xwe, çî çîçik, çî mezin, ber bi xwe ve bikîşîne û bibe perestîya wan.

Gelek tiştên bêhemiyet hene ko carina jin li ser wan disekin û bi stûriyê pergara mala xwe xerab dikin. Ji xwe erin her tiştî tevî hev dike û tamsariyê dixê hêlîna seadetê. Ji jinan re divêt ji mêran bisebirtir bibin û gava mêr dixeyiden ew sebirê bi xwe bidin.

Erin agireke, ji bo vekuştina wî, jê re av divêtin, jê re hênîkahî gerek e, ne agirekî din. Ber vê yekê gava mêr germ dibin divên jin honik bibin û wê germiyê şîrgerm bikin.

REWŞEN BEDIR-XAN

Can Yücel, Ahmet Soner û tayna hunerkerera gore:

# Yılmaz Güney yew dûvstêrk bi\*

Xocay mi, nızdîdi Yılmaz Güney di en zaf ti mendî, ti jey hemina hinya vêsêr sinasnenê û to inî nızdîyan ra namebê jey yew bêlge-yî film zî ant; yonî ma to ra vajê, pirspor/uzmanê Yılmaz Güney, ez vana qay xelet nêbeno?...

– (Hiweno...) E... ma şênê vajê... Ma new aşmi-yo ino bêlgeyî sero xebitiyay, inî hîndasî xeftiyayî-şîra pey anasar çî xwi bi xwi vejîyeno orte...

Yılmaz Güney sero hetona eyro zaf çî vajiyay, zaf çî nûsiyay; şîma sebeb dê ina bêlgeyî ra zaf mirdîma reyde qalî kerd, bêguman ki şîma hinya zaf çî newey banderbî. Ti inî pêrinra pey marê vanêse?...

– Ma ina bêlgeyî sero poncas tenîra vêsêr mirdîm reyde qalî kerd Labelê ma nişta xwi hemin birsnê, qalî kê. Mesela ma nişta, ayê ki welat ra teberdê ayno reyde qalî kê. Vitadê zî tayin qalî nêke... Eylâ ancînazî yew bêlgeyî da rind (baş) vejîyay orte. Bêlgeyî, zaf çiyekî hetona eyro nêzaniyaynê, nim-teybî ay vetî teber... Ayê merdimanê ki qalîkerd, hema hema fikrê jîn pêrin: "Eki Yılmaz Güney weş bibînêse-zeredê yan-zî teber di hêç ferq nêkeno-halê sînemada Tirkîya ino hewa berbat nêbiy-nê, hîndasî bêxebat nêbiy-nê" bi. Çimkî Yılmaz Güney, hêç yew wext bêxebat nêvindertê, se kerdê kerdê, çiyê viraştê, kerdê; him zî bêimkaney mandî...

Eylo sînemawanê inkayênî-en zaf zî sermiyan Ömer Kavur o imbar zî jey vanê: "Eses sebeb bêimkaneya..." Ino sebeb ra zî yew weqîf saz kerd (viraşt) û dewlet ra alîkarî (ardim) pawênê... – Ez anasar mazerato qet qebul nêkeno... Ez inomîş nêkeno ki seba film antişî illahî pey lazîmbê... Kam ki wazeno film bianco, wa tê de tikê îrade bibo beso, beso ki wa têde tikê cewher bibo... Yew ray Yılmazî mirê bahs kerd bê: O'yo imbazê xwi Ali Uğur, naşt daştra tay parçey filma veynênê; kamera finênê xwi polî ser ay parço reyde kuçandî film ancenê.

Yanî sifira dest pêkenê...

Badî zî şanê yew viraştexê filmwanî ra ay parçonê bînin temom kenê... Ino hal eyro zî marê rar (rayir) navnenê, şewq tebişeno. Yonî dêmeq bê-pereyî film virazêna. Mi verê zî va; besoki wa mirdîmî dê cewher bibo. Pê-ro dinya di zî ino gure anayo... Mi gore, wa mirdîm raşo yew cadê senaroy de xwi ra dest pê ko, bianco. Hela ma veynê şên-ino inî gurî biko no nişto, tira pey beylê beno... Mîsal; ayê ki reklam filmî ancenê 50-60 saniye di mesajê dinya danê temaşekerdoxa, eylesa ma çîrê nêbidê? Mi gore sînema gerekê milîtankî bo çîrê sey Yılmaz Güney nevejî-yenê... Ma çend imbazî NÇM (MKM) dê semînerê sînema danê, derdîma tîke zî anasar problema sero sere dejnayîşo...

Yonî şîma vanê, inî problem û "krîz" ana 'eses sebeb sînemaya bêmilîtani-ye ya?...

– Problem, eki yew mirdîm ki vono ez sînema virazeno, ay mirdîmî dê ja'r esto no çînyo eses problem vitayo... sîstem tikê zî ino sebeb ra vînder-to, nêguriyeno; ma coka vanê, ma rê milîtankî sînemawanî lazîmî... Sînemawanî verênî, roj bi roj xwi tekrara vêsêr çî nêkenê, aver nêşonê, niştê şorê, ina zî yew mîsala.

Ay tay zî estî ma vanê nesîl o sînemawanî nevey. Aynandî zî çî çînyo... Ay, bira kê vanê qay ina dinya ra niy, xebra jîn dinyara çînyo... İna anasar yew qal niya, raşta jey onaya; şorê film-manê jîn veynê şîma heq danêmi...

Xocay mi, ez vana qay Tirkîya di raşteraşt yew sînemawan-hunerker (sanatkar)-gelek çînyo. Eki bibîynêse Tirkîya di Kurdistan di hîndasî çî benê, ka yew heway ra

vengê jîn vejîyo?...

– Ti raşt vanê... Eki bibîynêse ino des serrî ra vêsêro Kurdistan di yew lejo pîl esto, ka inî biancê filmandê xwi. Sebeno, çî-beno nêcancenê, nê-nûsenê... Sebra (ûsteliq) gedey inî mirdîma zî ino lejî mandê... Sebeb sansûr ni-yo... Eses sansûr seredê jînd o, beyndê ini mirdîmand o...

Seba şîma vanê: "Ekoldê Yılmaz Güney ra yo", eyla-zanayîştê mi gorê şîma heyranê Tarkovsky zî; ino seniwa beno...?

– Ney, ti yanîş zonê... Sînemawanê mi; Angelpoulas o, Wajda o, Godardo... Yonî ayêki ti ra vanê; "Avant Gard (verênî)", ay sînemawanî. Ma-di malesef anasar sînemawanî çînnî...

Şîma gore zî, Yılmaz Güney seba sînemadî Tirkîya û Kurdistan yew "dûvstêrk" bi?

– E, mi gore zî ana bi. Çimkî anasar mirdîmî ana her coxrafya ra yew çend serîdî nêvejî-yenê; ancax 70-80 seridi ray vejîyenê (asenê). Malesef Yılmaz ira pey 'eyardê jey di yewer-na nêviyîya, ez inonêkenaki inkayra peyzi vejî-yo...

Xocay mi, hîdasî bêhêvî mebi, ti b'ewnikî semînerdê sî-nema da N Ç M (MKM) ra anasar yewer vejîya...

– Mela anabi, wa ezî şermîzar-bo...

Tayin gore: "Yılmaz Güney film da "Umut-Hêvî" reyda qezencê ekol (pêl) dê "Raş-teya Neweyinda İtalyano - Cereyana Rastiya Nû yi İtalyano..." bi. Ino behs-ra piya, eciba filma de sicay "Bisiklet Hîrsîzları-Dîzdê Pisqilêta" "Umut-Hêvî" sero yew



Ahmet Soner

tesîra ja biyo; anasar çî mimqun o?

– Mimqun o... Çîrê nê-bo... Labelê ino tesîr ana yewra yew niyo. Çimkî "Umut-Hêvî" yewna hewa yew filma... Badî jey (Y.Z) daha zaf film andê mexîka ra heskerdê... En zaf zî filma; "Kızgın Toprak-Hera Sûri (veşata)..."

Ti vanê: "Mi ray ray mecburey ra kaykerdoxey kerdê, çimkî ma niş-taynê mêrdîm veynê." Mesela "Ağıt-Deyira Merdiya" di ma'lemey, "Acı-Dej" di başçavuş... – E... "Yol-Rayir" di zî kondûktorey. Ma seba roldê kondûktorî Derbekî ra yew imbaz erdbê, labelê ayo imbaz kamera ver-dê qefilya, nişta kayko, mi zî mecburey ra cilê jey pîra giratî mi kay ke.

Seba Yılmaz Güney vanê zafin bê senaryoy xeftiyaynê, 'esli inî vatişo esto? Seniwa bîndê?

– Ayê wexto raşta zî ona kerdê. Hêç yew film-da xwi di qedyaye yew senaryoy reydi dest pê nêkerdê. O, sere-dê xwi di tay fikra reyde ameynê sette filma. Vitadê anasar yew cadê film ra dest pê-kerdê; tira pey zî çî lazî-mase vita tamam kerdê. Planê antişanda filma vita qerar daynê. Ino bahstî zaf cesur bi, zaf înad bi. Eki çiyoki hiştê xwi kerdose miheqeq kerdê. "Serdestê" Yılmaz Güney tîkey zî vitadîbi...

Ino bahstî yew çî ame mi virî; e ja neql ka: Ma İstanbul di Filma "Umut-suzlar-Bêhêvî" ancenê. Novelê mafyabi. Kay-

kerdoxana namey dilawerî (kebadayî), Firat bi, ma keynekîrêzî yew name dûşmiş bîndê. Mi nişta fe-kê xwi tepîşa; mi va: wa namey keyneki zî Dicle bo, gedey jîn zî biyse wa Mezopotamya û Şatûlla-rap bo... helbet mi henekî kerd bi... Yew gam mira hewniya, çî nêva, labelê mi fam kerd ki hêrs bi-yo... Ma ancîna bêseneryoy xebityaynê...

... A serri "Ağıt-Deyira Merdiyo", "Acı-Dej", "Umutsuzlar-Bêhêvî" heme hîren piya Festivalde Filmandê Edena di xeleya en baş girat bî. Inî filma mandî "Deyira Merdiya" tena viraştexeya Güney film bî. Yılmaz Güney, pey ki ina filma girotî 14 xebatoxa mandî bar kerdîbî. Hetona eyro hêç yew viraştexî anasar yew çî nêkerdo Yeşilçam di.

Vanê; "tay mirdîmî îmajê Yılmaz Güney şa-irane yew eday reydi qî-ler kenê", seba Nihat Behram î... Şîma vanêse ino bahstî?

– Evrupa di jîn mandê çî viyart ez nêzono. Labelê Yılmaz zaf hêrsin bi. Ray ray xwi vîndî kerdê û teferuatî sero zaf vîndertî-şê jey, ray ray bî nêki pey mirdîmî şikîtenê. Mesela antiştê filmada "Bêhêvî" di, mira hîrsîbî, labelê hîrsê xwi imbazê gedeyda xwi Nihat Ziyalan îra girot bi... Kê anasar çî-ya wexto ki gêne çîmandê xwi ver, ez vano, belkî cay beyntar di jey û Nihat Behramî mandî zî anasar yew çî viyarto. Labelê çî-yo ki Nihat Behram î seba

## PORTRE/ AHMET SONER

1 945 di Üsküdar di marda xwi ra biyo. Lîsera pey, kitab roştexey û sewbîna gurandê, 1966 ra dim sînema sero xebitiyeno. Yew wext sermiyan Atif Yılmaz î rê ponc, Yılmaz Güney rê çiyer, Lütü Akad, Vedat Türkali, Şerif Gören û Yavuz Özkanê rê yewer filmde yawerey qieno.

1967 ti novelde Samim Kocagöz î ra yew filma kir anceno: "Asayîş Berkemal-Weziyet Rindo." Tira pey serara; bêlge filmê "Gerze Tütün Mitingi - Gerzedê Pêşanda Tütünü, Altinci Filo-Filoy Şeşin û Kanlı Pazar-Bazaro Gunin" antî. 1977 ti Festivalê Filmandê Antalya di name dê "Ekmek Masalı-İstanika Nani" di yew filmda kiri reyde dekewno. 1967 ra dim.

"Yeni Ufuklar" "Genç Sinema-" "Ant", "Yeni Dergi", "Kitaplar-Kitabî", "Cumhuriyet", "Sanat Ekî-Çandar pa", "Yeni Sinema", "Milliyet Sanat", "Argos", "Gerçek", "Özgür Gündem", "Özgür Ülke", "İnsancıl", "Evrensel", "Yeni Politika" û teyna kovar û rojnamenê nuştexey keno...

1974 ra pey "Türk Haberler Ajansı-Ajansa Xeberandê Tirkîkan" di kamervaney û bêlgeyî anti.

Nivistandê jeyra, ponç parçera viraşta "Hayatım Roman-Emrêmi Roman" (1979), Hewt parçera "İş İştir-Gure Gureyü" (1980) û şeş parçera "Çocukların Dünyası-Dinya Geda" (1990) ancîyay û TV di nawniyay. Tayna seneryoyandê jeyra, "Herhangibir Kadın-Anasar Yew Cenî", "Tomruk" û "Derman" hetê Şerif Gören îra ancîyay filma. inanra vêsêr dawîst heb seneryoy jey ancîyay filma. En peynî de zî Yılmaz Güney sero yew bêlgesel film ant.

1995 di adarî de, "Weşeng de Sorun" îra yew kitabê jey vejîya. Namey kitabde jey, "Akıntıya Karşı-Vera Herikan"...



Yılmazî kerdo, gereka kê inqar nêkê. Teber vetiş tê jeyra tepîşê, hetona kar û guredê jeydê bîna.... Mesela "serdestê (başarı)" jeyo ki Avrupa di bi, bara Nihat Behramî tayin nêbi. Eyla inî pêrin heqo ki kê Nihat Behramî ra pers kê. Labelê hetana eyro ma nişta xwi bideresnê, îmçanê ma nêbi....

**Sinemadi kurdî sero yew xeyretê jey bi?**

- E, ez vano qay anasar yew xeyretê jey bi.. Mi goştarit ki sey filmda "Bir Ulusun Doğuşu-Xelasbiyayişê Yew Welat" i yew film sero xebityaynê....

**Ino hewa jey kategori- da sinemada tirkana nê- vejênenê?..**

- Ney, çimki Yılmazî, neve çî biviraştê, çî biantê- se ancina temaşekerdoxa- nê tirkana tesîr kerdênê. Ino tamamîla hissî yew çî- yo, eleqedareya... Ino his- siyat tena him lazimo him zî bes o...

**Tay mēdimandê ma mandî tikey zî bibo, he- ze ki tikê Zazayey û Kir- dasî yey esta... Yılmaz Güney anasar çiyana se- nîwa hewniyaynê, vatê se?**

- (Hiweno..). Willa ez anasar çiyandê şimara hinasî fam nêkeno.. La- belê fragmendê (qisim) bêlgeyî di en verêndê; Yil- maz vono: "May mi kirda-

si ya, pîmi zaza yo." Ez vono qay ona hewawo ki şima bahs kenê anasar çî- yana hinasî rind nêhew- niyaynê.... Mi verê kur- deyra jey sero çekî nêza- naynê; eses mi ayê wexto hêç nêgoştaritki kurdî qalî kerd. Labelê ma seba film antişî bişînê yew dew, ma hewniyaynê ki Yılmaz, ayêki darmaredê jeyra top benê, jîn reyda hinasî weş têqeno ki, he- zeki çiman dê xwi reyde qalikenê... demeq xwi rê gûniya jîn yewînan ra gin- yaynê... Badî ma banderbî ki kurdo, ma va: "Ti çîrê qalî nêkenê?" Va: "Ez zaza yo..."

Filmê jeyê peynî yew kinar, vexo ki Fransa di bi, pêro dost û dormaran dê xwi rê edresa Enstîtû ya Kurdî daynê. Ma tira fam kenê ki; yewin; Yılmazî waştêki wa hemekes biza- no ki o aîdî vitayo, didin; kerdênê ki wa vengandê jeyra belkî yew fayde biro vita. Xwira ayê kar û gu- rey jey bînî zî ma raşt ke- nê...

**Ma tike zî 12 Mart' (Adar) ra bahs bikê, ayo çax sekerdê, çikerdê?**

- Ayo çax, ma lstenbul di filma "Yarın Son Gün- dür- Siba Rojo Peyniyo" antenê. Qedyayişê film ra ver, pulîsa Yılmaz Güney girot berd. Sebeb: Ayo rojo Başqonsolosê İsrail î El-

rom kişiyabi, ayo sebebra Mahir Çayan, Hüseyin Ce- vahir û Oktay Etiman gey- riyaynê; Yılmaz Güney zî inî mirdimî kaydê xwi di limitîbî. Jey des rojî Xandê Sansaryanî (Qereqol) di te- piştîşira pey veradanê. Ez vano qay ay beyntar di ti- kê telqin kerdo bide: "Ti hinasî yew hunerkero (sanatçı) pîlî, rê medi inî gedo- gûda, alaka xwi ini- nara birni ,ew yew wext ti orte di nêasê seba to rind beno" anasar çî... Ma film qedêna û tira peyzi şî Ürg- üp. Ma îdaredê pêti (sıkı- yönetim) ra dûrîra di aş- mîdi di filmî anti: "Dej û Deyra Merdiya". Oncax ino beyntardi yew gam zî şoreşgêran ra alako xwî nêbirna. Inî gurey seba jey heme çîra verdbi.

12 dê adarî ra pey, ez vono qay tayin qalî kerd... Tira pey zî kewt hepis... Badî zî tay fikrî yewbinan- ra cêra bî.. Wexto ki vejîya teber, hema hemekes (ko- melî) waşt ki wa jîn het- bo... Labelê jey namebê "Ekim (Seba Xelasbiyayişê kedi Xebat) î yew komel (teşkilat) saz kerd... Heto- na ki merd, serekê ina ko- meldibê. Ay rojo yew Newroz di vatbê: "Koyma ma pavenê, ma şorê welat tê xwi..." Ez inî qalana fam keno ki eki Yılmaz weş bibînêse ,belkî zî eyro dest sileh (tîfing) koyandê

Kurdistanî dê lej (herb) kerdênê...

**Şima marî tikêy zî bahsê bêlgeyî bikê...**

- Ma bêlgeyî qedêna. Labelê zaf derg vejîyay, çewres seetî ra veşêr... Ma vanê, ma vatişanê qalîker- doxa bikê kitab. Film, te- maşekerdoxandê sinema gore zaf derga... Ma ino sebeb ra xebitiyênê ki kilm bikê, mi 90 deqa kopya he- dirnaya seba "Adana Altın Koza Film Festivali- Film Festivaliya Qoza Ze- rina Edena." Eyla ma ino hallar zî qedyaş ra nêhe- sebnênê. Çimki hewawo ki ma verêzî va; ma hema zafin reydi nişta qalîkê.. Ino heway film zî ja kena yew versiyondê 1995. Yo- nî mi gore ma key ki ay mirdimandê bîna reydezi qalî kerdse anax ayo wext temom bena...

Mesela, ma rehmetlî Onat Kutlarî reyde, merg- dê jeyra yew çend rojî ra ver roportaj kerd. Ino he- wayra ma zaf qiymetlî yew parçe xelisna. Yewna mîsal: Ali Özgentürk o; Özgentürkî verê ino bahstî qalî nêkerdbi. Ma yewna ray şî jey hetî, ma misala Onat kutlarî da bide... Ma wa; kê inî bahsa xwi reyda berê mezêl hînga rind be- no?... Inî sero Özgentürkî ma nêşiqitî, yew seet û nêma reyde qalîkerd. Zaf keyfê ma pey bide

ame. Ino hal mela ay mir- dimandê binanrêzî yew mîsal bo...

Ay mirdimki teberdê, ma seba jin zî yew formûlî sero geyrenê, ma eciba se- ni şênê xwî jîn biresnê? Mesela Sey Fernando Sala- nas û Nihat Behramî...

**Şima nawitiştê film û sansûrî sero çî dûşmiş be- nê, seniwa nawniyena? Wayirê televizyono seni- wa hewniyaynê?..**

- Ina sera wayirê tay TV'na omev...? Ma zî sero vîndenê. Ê zî film temaşê qenê, herhal badî qerarê xwi danê. Labelê eses nêtê ma Evropa di navitişo. Film (bêlgeyî), daha zaf ino fikrî sero virazyay, texmîne mi verê, aşm da payizîdê didin di TV'dê Cine 5 ti navnêna...

Sansûrî sero se; ma yew çî kerdişra zaf ma bi- şênê çika binawnêse hin- dasî karo... Eyla ino bahstî qala peynî êdê Fatoş Gü- ney a . Tabî ma wazenê ki wa bêsansûr binawniyo... Nêbise, ma qo averdê MED TV di bêsansûr te- maşe bike...

**Mirdimandê merdî- yan ra dim, daha zaf hew- leyda jînra, kiştâ rindey- da jînra bahs beno... Pey- nîdi Yılmaz Güney zî yew mirdimbi, zââf û kemîyayeya jey zî biyayiş normalo. Ino bahstî ti marê vanêse?**

- Sinasnayişte mi gore, Yılmaz zaf hêrsin bê, xwi sero qalîkerdişira ta'mul nêkerdê, kê qritikê jey bikerdêse şikiyaynê; ino xuy jey saade yaverandê xwi nêbê, xocayandê xwi rê zî anabi... Yalaviz zaf titîz bi, çî gurî ser bixebitiyaynêse zaf diq- qatê teferuata kerdê. Qetî suretra xeta qeub nêker- dê. Labelê fikrandê neweyona zî padaye nêbi. Heme fikrî goştaritê, hêç yew fikirdê maqulî ra nêvatê nê. Xwi ra qezencê jey pêro cerebnayişî ser- abi...

**Jey sero yew xatiro şimaya enteresan esta?..**

- Wexto ki Hepistê İm- rali di tepîştew, sernewye zewajdê jîno newino (9.) İno sebeb ra, seba her rojî yew kerra piserkeno û dekeno ciwalo ew beno Fatoş Xanimrê... Yonî 3285 hebî kerey. İnî kerrey anasar kerrey nî, kerrey verdê derî, verdê roy; xis- usî piser kerdî.

**Ez vono qay sey anasar yewna mesela jey esta...**

- E... Ayo çax di Fatoş Xanim reyde cirgiyayey. Seba pêomeyişî- wextra zimatan-şona hewtay û di (72) çeşitra yew kam- yona çiçeğa derê er- şaweno...

**Ma zonê ki şima, verênayra zî yew çend bêlgeyî filmî viraştî (an- tî); ew şima Bêlgeyîda Yılmaz Güney ra pey, bêlgeyîya Musa Ante î, İsmail Beşikçi, Abdullah Baştürkî, Hikmet Kıvılcımlı û "Halk Gerçeği, Yeni Ülke, Özgür Ülke, Özgür Gündem, Yeni Politika ra dim, HEP-DEP sero zî yew bêlgeyî dûşîşbenê. İnî pêrinra pey, ma şênê şima ra vajê Ara Güler ê sine- ma...?**

- Hema rewê... Ez Ara Gülerî ra zaf hes keno. Zaf baş yew fotoxrafwano. Bewnî ez şimarê jey sero "enteresan" yew çî vajo: Verê jey zî waştê ki sinemawanbo. Heta teq filma jeya vernên û pey- nîyên ma piya ant. Ayo wext kamera nêsinasnay- nê, mi zî derê yaverye ker- dê. Namey film: "Bir Kah- ramanın Ölümü- Mergê Yew Egîti" bi. Novelê ina film, "meşur" (vengan- daya) Yavuz Zırhlısı- Zirxliya Yavuzî parçeker- dişî reyda cilet viraştîşî serobi. Hukmatî ina film yasax kerd. Yonî aqildê sansurwanan gorê egîti seniwa binê cilet... Hal- buka a Yavuz yew gemiya lejî bî...

**\*Düvstêrk: İstarew boçin...**

C. ZERDÜŞT PİRANIJ



Sermiyan, nuştox û kaykerdox Yılmaz Güney des û yew serri ra ver ma ra cêrabi bi... (1.4.1937-9.9.1984)

# DEFTER

## Peymana Dublînê firotina Kurdistanê ye

Bêguman her kurdekî niştîmanperwer û dilsoz bi rawestandina şer dilşah dibe. Dema mirov li vê armanc û encama peymanê dinêre, wê demê ew şahî û dilxweşiya mirov diçe û di şûnê de dil-tengî, dudilî û xemgînî bi mirov digire. Mirov baş dibîne ku Peymana Dublînê ne bi tenê ji bo kurdên Başûr her wiha ji bo kurdên Bakur jî peymanê felaketê ye. Mirov dikare bibêje ji bo me kurdan Lozana duyemîn e. Peymana Dublînê bi qasî ku di medyaya cihanê de derket wiha ye.

Di peymanê de navê Kurdistanê derbas nabe. Wekî ku tirk bi nav dikin, navê wê Bakurê Iraqê ye. Li Bakurê Iraqê çar gel hene. Ew jî tirkmen, ereb, asûrî û kurd. Ji her aliyê ve mafên wan yek in. Temsîliya van gelan jî Kongreya Neteweyî ya Iraqê (INC) dike. Serokê Kongreya Iraqê jî A. Çelebî ye. Ew bi xwe jî ereb e û dostê Tirkîyeyê ye. Di peymanê de xala (niqeteya) herî girîng û balkêş yek jî, parastina tixûbên (sînorên) Tirkîye-Iraqê û parastina emniyeta Tirkîyeyê ye.

Hîn murekeba Peymana Dublînê zîwa nebûbû ku, berpirsîyarê delegasyona PDK Samî Abdurahman daxuyanî didan roj-nameyan û wiha armanc û naveroka Peymana Dublînê eşkere dikir "Li gorî peymanê heger Tirkîye pere bide, em dê 20 hezar pêşmerge bi çek bikin û li dijî PKK'ê sînorê Tirkîyeyê biparêzin..."

Piştî Peymana Dublînê Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan di Med TV'ê de digot ku: "Tirkîyê dijminê kurdan yê tewrî mezin e. Tirk ne bi tenê li Bakur, her wiha li Başûr jî naxwazin kurd mafên xwe yê neteweyî û demokratîk bi dest bixin. Tirk ne dostê we ne, dijminê we yê herî mezin in. Pêwîst e ku PDK dev ji vê îtîfaqa



AMED TİGRİS

dijmin berde. Û em hemû kurd bi hevdu re federasyonêke demokratîk ava bikin û heta dawiyê biparêzin. Na ku PDK bi tirkan re bibe yek, ev jî sedemê şer e."

Belê, di roja 26'ê meha 8'an de, PKK bi navê Peymana Birûsk êrîş bir ser sengerên (qereqolên) PDK'ê yê ku ji aliyê tirkan ve hatibûn çêkirin û şer dest pê kir.

Bi rastî ev pirs ew qas zelal û eşkere ye. Lê dîsa jî hinek kes li ser navê rêxistin an jî rewşenbirtiyê li Swêdê belavok belav dikin û dibêjin ku: "Divê em kurd li destkeftinên Dublînê xwedî derkevin..." Wey malxer-abno kîjan "destkeftin"? Ma firotina Kurdistanê jî destkeftin e. Vê carê Başûr û Bakur bi hevdu re difiroşin. Heger hûn ew qas welatparêz in û li dijî dijmin in, çima hûn li dijî tîkiliyên PDK û Tirkîyeyê ranawestînin û îmze berhev nakin? Di sala 1992'yan de jî dema pêşmergeyên PDK'ê derketin ser tankên tirkan û ala Tirkîyeyê dihejandin jî, tê bîra we, we digot "Dewleta Federe çêbûye, lê PKK naxwaze." Ka ev dewleta we ya federe? Çi lê hat? Îro jî hûn jî Peymana Dublînê ya îxanetê re dibêjin "Destkeftin." Mirov ew qas kor nebe. Hinek ji we, ev 10-15 salên we ne ku hûn li Swêdê ne, ji bo welêt gelo we heta îro çî kiriyê? Welat û gel tu carî nehatiye bîra we? Hûn di çend salan de carek xwe didin pişt îxaneta PDK'ê û li ser navê niştîmanperweriyê êrîşî PKK'ê dikin. Ma hûn jî ber zilm û zordariya vê dewleta tirk revîbûn û nehatibûn Swêdê?

# Şerê li navbera PKK û PDK'ê berdewam e

Şerê ku di 26.8.1995'an de li navbera PKK û PDK'ê rûda berdewam e, Tê gotin ku PKK çend deverên stratejîk ji destên hêzên pêşmergeyan standiye. Ji aliyê din ve, tê ragihandin ku PDK digel Tirkîyeyê ji bo şerê li dijî PKK'ê amadehiyên xwe dikin.

31.8.1995- Piştî destpêkirina "Operasyona Federalî ya Demokratîk" ji layê PKK'ê ve, hate zanîn ku di encama çavpê-keftinên PDK'ê digel hevpeymanên xwe yê navneteweyî, biryara operasyonên hevbeş wergirtine. Li dûv vê peymanê dewleta tirkî hêzên xwe yê ku li ser tixûb kom kiribûn, beşeke mezin ji vê hêzê jî bo êrîşê amade kiriye. Ji bo dorpêçkirina hêzên PKK'ê, hêzên dewleta tirkî jî Xuwakurkê û yê PDK'ê jî ji devera Şêrwanê dest bi bizavê kirine. Li dûv agahiyan, ji ber şerê di navbera gerîla û pêşmergeyan de, ziyannên mezin bi daristanên deverê ketine.

Dîsa hate zanîn ku dorpêçkirina kampa mişextiyên Bakurî ya Etrûşê ji layê pêşmergeyan ve hêj berdewam e. Birin û anîna alîkariyê jî bo kampê, bi tevayî rawestandine. Çûn û hatina nûnerên Koma Miletan (Dewletên Yekbûyî) jî qedexe kirine.

1.9.1995- Hêzên gerîla li Çiyayê Garê êrîşî ser bineciheke pêşmergeyan dikin û di encama vê êrîşê de 2 pêşmerge tene kuştin. Li ser cadeya Qedişê û Amediyê jî, piştî êrîşa pêşmergeyan li ser hêzên gerîla, hate zanîn ku 4 pêşmerge mirine. Li navbera Metîna û Qesûriya, li devera Kanîmasiyê, hêzên ARGK'ê êrîşî ser baregahekî PDK'ê dikin û li vir jî 12 pêşmerge tene kuştin, 2 jî bi saxî ketine destê gerîla. Li devera Sindiyan, li derdorê Derkara Ecemê, hêzên gerîla jî pênc milan ve êrîşî ser hêzên PDK'ê dikin. Li devera Mizûriyan jî êrîşên gerîla yê arasteyî pêşmergeyan bi tundî berdewam in. Hate zanîn ku di van êrîşan de hêzên gerîla gelek çek û teqemenî jî pêşmergeyan standine.

Li ser gaziya Serokê PDK'ê Mesûdê Berzanî, artêşa tirkî hêzên xwe li



deverê kom dike.

3.9.1995- Şerê li navbera PKK û PDK'ê her dihere berfirehtir dibe. Hêzên PKK'ê ji aliyekî ve li hemberî êrîşeke berfireh xwe amade dikin û ji aliyê din ve jî, ji bo ku gundî ziyane nebînin, li devera Behdînan hindêk gundan berdidin. Hate zanîn ku li Çiyayê Garê, 3 girên stratejîk li raserî Sersingê ji dest pêşmergeyan hatin derxistin. Di vê êrîşa gerîla de pêşmergeyek miriye û 3 jî birindar bûne. Li aliyekî din, hêzên PDK'ê jî bo riya Zaxo û Batûfê jî bin kontrola gerîlayan derxin tene deverê lê, tûşî berhingariyêke xurt ya gerîlayan tene û di encama şerekî dijwar de 2 zîlên pêşmergeyan têk û pêk diçin û 8 pêşmerge bi saxî dikevin destê gerîla.

Ji layekî din ve hate zanîn ku PKK û bi alîkariya Tirkîyeyê PDK, ji bo şerekî dijwar û berfireh xwe amade dikin. Li dûv pîzaniyan, arteşa tirkî digel PDK'ê li vê heftiya pêş, ji bo destpêkirina operasyonan xwe berhev kirine. Bi armanca ku ziyana negihe gundiyan, li devera Barzan gundên Sîna, Gwîzê, Mîroz, Şivê û Binderê jî layê PKK'ê ve hatin valakirin.

5.9.1995- (Zaxo) Piştî destpêkirina "Operasyona Welatê Rojê" ji layê PKK'ê ve, cara yekê ye ku PDK, bi hêzeke mezin êrîşî ser hêzên PKK'ê dike. Digel vê êrîşa xwe, PDK'ê ragihand ku 33 gerîla hatine kuştin lê, li dûv daxuyakirina ARGK'ê, ev şerê navbirî bi vî rengî bûye. Bi alîkariya arteşa tirkîyeyê PDK'ê bi hêzeke mezin

ku ji 1200 pêşmergeyan pêk hatibû, bi çekên giran êrîşî ser 2 betelyonên gerîla dikin. Di vî şerî de, digel hebûna ziyannên gerîla, hate zanîn ku gelek ziyana bi hêzên tirkîyê û en PDK'ê ketine. Li dûv pîzaniyan 32 gerîla di vî şerî de bê ser û şûn bûne. Roja din 2 gerîla gehîştine baregahên xwe û li dûv daxuyakirina wan, di destpêka şer de fermanderê betelyonê Şahîn tene kuştin. Digel kuştina Şahîn, hêza gerîla şepirze dibe û bê serûberî di nav wan de dest pê dike. Di duwemîn pîngava şer de, fermandarê duwemîn betelyonê Bedirxan jî tene kuştin. Ji bilî van, me zanî ku 7 gerîla bi dilî dikevin dest PDK'ê. 3 gerîla jî vî sibê (5.9.95) gehîştin baregahên xwe. Rewşa 20 gerîlayan mayî jî heta niha jî layê me ve nehatiye zanîn. Li aliyê Bakur, li dijî hêzên hevbeş yê PDK û arteşa tirkîyeyê şerên dijwar rû didin. Hate zanîn ku di van şeran de 39 pêşmerge mirine.

### ARGK'ê, bilanço ya cengê ya heyva gelawêjê ragihand...

5.9.1995- Arteşa Rizgariya Gelê Kurdistanê (ARGK), ragihand ku bi hêzên arteşa tirkî û cerdevanan re, di heyva gelawêjê de 420 pevçûn û şer rûdane û di van şeran de 531 kesên ji arteşa tirkî û 156 cerdevan ku bi tevayî 678 kes in, hatine kuştin û her di vî mehê de 92 gerîla jî mirine.

Di encama şerên heyva gelawêjê de, albayek, 2 teymen, 11 astubay, 5 uzmançawuş, 8 polis û 505 leşker, hijmara giştî digel 531 leşkeran, 156

cerdevan hatine kuştin û 67 kes jî birindar bûne. Her di vî mehê de, leşkerek, 39 cerdevan, bekiyek û 3 ajan ku hejmarê giştî 44 kes in, ji layê gerîlayan ve hatine girtin.

Dîsa di vî mehê de, 10 zerîpoş, 24 zîlên leşkerî, 13 trûmpêlên çete û nokeran û hinek dezgehên dewletê yê cur bi cur ku ji 49 alavan pêk hatibûn, digel 2 loqomotîfan bi tevayî tene serkutkirin û di Bendava Kebanê (Baraja Kebanê) de jî feribotek tene seroqkirin. Ji bilî van, helikopterek, 2 tank, kariyerek, zerîpoşek û 13 trûmpêlên leşkerî digel 19 trûmpêlên nokeran hatine tîksîkandin û ji kar ketine. Dîsa di vî mehê de, danîşaneke tv., 2 karxane, 2 şantiye û digel 6 avahiyên dewletê ku wekî biryargeh bi kar dianîn, bi tevayî hatine rûxandin. Xeta boriyê ya Kerkûk û Yumurtalîkê carekê hatiye peqandin, 3 çalên ku petrol jê dihat derxistin bi bombayan hatine herifandin. Digel 14 xetên elektrîkê xeteke enerjîyê û 2 şebekeyên avê bi berêrîşên gerîla ketine û 5 trafo jî bi bombayan hatine hingavtin.

Her wisa, digel daxuyakirina gelek destkeftiyên leşkerî, ziyannên gerîlayan PKK'ê jî, li Botanê 11, li Zagros (Behdînan) 21, li Herêma Mêrdînê 8, li Herêma Xerzan 8, li Herêma Amedê 12, li Dersimê 20, li Erzîromê 1, li Serhedê 1 û li Torosan jî 1 gerîla ku hijmara giştî 92 gerîlan e, mirine û 29 gerîla jî birindar bûne.

DEM/Welatê Me

Naye di tédima komêl bî ra. Her raman ra alewiy dorme na kome lan di amey pêser. Dew letê ki naye rind di, tal nêvînet. Dest na pi ra rojnamanî xo di, televîzyonanî xo di qalî alewiyyey kerd, alewiyyey goyna. Keşê ki ramanê dew letê ser pirtukan nuştî, nînan vet ra alewiyan ver day nas kerdene. Ni ki riyî pilanê xo şa nêkerd, tima fekê dewletê ra qesey kerd. Komelê ki bî ra zafe xo kewt ra mordemanî dewletê dest. Ekî hên rojnaman di, televîzyonan di qalî alewiyyey kerd, goynay, tayinê ri wes ame. Taye kes ki va : "No xêr niyo hela seni fêndo." Çi ki hata na nejdî keş nêskiyîni ki alewiyanê xo eskera kero. Na komelan di taye kes niyada ki serrekê xo jêde fekê dewletê ra qesey kenî, ci ri wes nêame biriyay ra. Taye xo poşt day serekanê xo, xeylê keş ki hete ra ramanê serekanê xo rex nay onca ki dîr nêkewt. Çi ki zere û can ra waste nê ki çandî xo ri wayîrey bikerî. Bawer kerdene ki nê komel ki rind biguriy xeylê xîsmetê rend vînenê.

Na nuşte di hebi hebi ca guretana her çî fam beno ki bêmkano. Hon di ki bese kerd na babet ser gelemperî vînetu. Onca ebi zafey alewiyyê kurdan ser ramani xo ard ra zu.

Ewro sepkeriyo? Ramanê dewletê zano. Serrekê komeley alewiyan zanîno. Şarê alewey, ebi zafey kurdi xo xoserîna Kurdistan ser poşt dê Şoreşî Kurdistan. Onca Tirkiya di alewiyyê tir ebi zafey Şoreşgeranê demokratane Tirkiya ser şonî, poşt danê ci. Na niya ki hemkarê xo çîni. Onca dewletê tal nêvîndena, hete ra hemkaran vezenaverê alewiyan. Hora keso ki hasaro wayîrê zaneyo, naye di barê xo her ki şî biyo giran. Gerek bindê alewiyye, dîrokê alewiyyey ser vînderî, şarê xo wayîrê zaney kerî. Onca haqa keş çîna ki vazo "Alewiyy kome lan ranêkerî, çandê xo, baweriy xo nêramî." Alewiyy bo baweriy bîn bî gerekî hurmet bi ci bo. Vatena mi na wa ki keso ki wazeno alewiyyeyî xo biramo, veri cuy dîrokê xo di niyade. Dost dismenê xo naske ro. Keso ki hasaro nî komelan terkî kemalîstan mekero. Çi ki zanîno, wazeni ki nî komelan bi-



## Alewiyyey ser

(2)

çarnî nîre milê alewiyan.

Xelasa alewiyan poşt darîna zilm niyo. Cumhuriyet ra dim Dêrsîm, Qoçgîrî rind zanîno. Na nejdî di Maraş, Çorum, Sîvas, Gazîosmanpaşa.... onca heşya keş ra nêşiyoy. Zanîno ki çond qirkerdena alewiyan ki biya tima destê na dewletê pa biya. Waxto ki Sîvas di wesawes mordêm ves nay, mordemî. Hukmat en cera bi en cor pêra vat: "Haqê sikir tewayî millet çîno". Poşt day qetilan, kerdeskera ki wayîrê na zilm onca hukmat bi xo yo. Naye di herkes onca rind di ki wayîrê na zilm kam o. Taye keş ki (rind ki name xo veti pîlî alewiyan) xo na kerî, çîmanê xo cinay pêro. Xeyret kerd ki hersi şar tarîqatan ser çarnî, dewletê na tenge ra ki bixelesnê. Serekê na dewletê va: "Haqî sikir tewayî şar çîno." Wayîr veciya qetilan, çî hêf hona adiri Sîvas nêşaybiwe Ankara di daweta rakerdana bonicem kerd. Tambur bi hona taye çiyî bîn halet day çî.

Yane xiyanetiyyê şehîdî Sîvas kerd. Naye ki binuşîn hona ki buyera Sîvas nêbîvî, dewletê heta ra alewiyye goyneynî. Dima na buyer bî. Zaf nêwerd nafa ki Gazîosmanpaşa di millet ard qirkerdene. Şar xo est ver xeylê şehîd day. Reyna di ki zilm kotî ra yeno. Çi hef taye xayîn onca fekê wayîrê zilm ra qesey kerd. Wast ki dewletê onca bêguna ve-

ze. Riyî nînan ki rind bi eskera. Waxto ki buyer bî pêro vost şî werte sar. Çik ki taye hesavê xo eş bî. Şar rî nînan nêda, def kerd.

Nika ewro hema her çî biyo eskera. Heya alewiyy zilm dî, hona ki vînenî onca zanîno ki Kurdistan bo Tirkiya bo hona cayê bînan di taye baweriy bi şarê bîn bi zilm vînenî. Kurdistan û Tirkiya di wayîrê zilm juyo. Xelasa pêrîni na wa ki dest berze jumîni. Herkes hurmet bi şarî û baweriy jumîni kero. Zilm pîl ewro alewî bo şarî bo kurdan seno. Xelasa şaranê Kurdistan û Tirkiya ki xoverestene ra vereno. Şoreşê Kurdistan şoreşê Tirkiya wo ki. Kurd ki gerek niy rind bivîni, eke cera ci dîrokî xo di niyada vînenî ki alewiyy bi şafîyan azmela jumîni kerdî saltanatiyyê xo ramitî. Zirarê pîl resto kurdan. Sarewardayena kurdê alewiyan ra şafî, kurdi şafîyan ra ki alewiyy dur vînetî. Ge ge ki poşt dê ra dismenanê xo, hurdî het jumîni qirkerdî. Bîndestiyê biyo qederî hurdî het. Qoçgîrî di alewî, Palu di şafî, Agirî di şafî, Dêrsîm di alewî teyna mendî, amey qir kerdene. Hora hurd hetî ra keşê ki ewro qalî baweriyî kenî jumîni ra dîr vîndenî, nînan xo vîra mekerî.

Di qeseyê mi ki komelî ki name alewiyan ra veciyî, serekê nînan ri eştî. Hora hale nînan eskera wo. Rew rew voze-

nî çêwêrê dewletê. Sarewardayena kurd, şoreşgerî demokratane Kurd û tirkan terorist name kenî. Ni hora herkes het ra nas benî. Dêrde nînan raşt alewiyyey niyo. Leye dewletê di ca gureti, menfaatê xo ser neteweperestanê tirk sergurîni. Ni dostê şarê ma niyî. Zanîno alewiyy çond sey sero ki xo estî ver, ebi se hazaran şehîd day. No hale nînan nêskîno dîrokê alewiyyey. Venî cuy alewiyy ki çêwêrê zaliman di qulbiyyîni hondi zilm ki nidiyîni. Hema înan ra kes çêwêrê zilm di qul nêbî, neqiyî qebul nîkerd. Ebu Mûslîm Teberdar (Horsanî) zaliman di da pêro. Hallacê Mansûr ejîravi girs ra ame kistene milê çewt nêkerd. İmamî Kербelay teslîmî zaliman nêbî.

Onca Seyîd Riza şarê xo, welatê xo ser can da, milê çewt nêkerd, mali dîna ser nişî. Des hazaranê Qoçgîrî û Dêrsîm milê çewt nêkerd. Veyviki Dêrsîm ki domananî xo yan ki xo kemeran ra est, est Çemî Munzir qese xo yî peyan "Ya Xizir, ya Duzgîn Bava, ya Mûnzir Bava bî." Şima ewro welatê xo ser na ewliyyanê xo jiyar diyaranê xo ser sekenî? Hora ki derdê şima raşt alewiyye yo. Ew ro hema her roz jiyar û diyaranê şima sanenî topan ver. Xortê ki ciwanikê ki a welat ser danê pêro, şima çim di teroristî. Nîzan zere şima reto? Mes-

tî çutirî hesav danî şar û domananê xo?

Şarê ma gerekî nînan rind nas bikero. Ew ro qasi MHP bi Refah ki wastera dewletê ser dest estî alewiyan. Çimê şar gerekî na komelanê xo û gurayîsa înan ser bo. Çi ki werte her şar di cîsnî zarane kem nêbeno. Xizir Paşa, Xayîn Rayber coru keş vîra meşero. Onca xeylê keş na dewlethe laîk saykenî. Hora dewletê ki rew rew na qese ana ra zu. Ebi tarîqatan ters dana şar. Hema ew ro zanemê ki na dewlethe laîk niya. Waxthe osmanijan di ki Şeyhülislam çî

Hete ra kki vanî : "Alewiyy poşka laîkenê." Na laîkena nînan laîken niya. Laîkena raşt ebi şoreş ebi xo seriyî yena. A waxt herkes raşt raşt xo ser beno. Alewiyy ki Qoçgîrî di, Dêrsîm di tufang est dewleto na laîkena nînan ra nêxapiyay, xo seriyê xo ra nêvêrd. Keso ki alewiyyê kurdan ra yeno, şarê xo înkâr keno onca alewiyyey ki sanero riyî xo ver, bizano ki Seyîd Riza, Alîşer Efendî bi hona şehîdê Qoçgîrî û Dêrsîm alewiyyey şima ra rind zanitenî. Nînan ra kes kirmanceno xo ra nêvêrd. Keso ki qalî alewiyyey keno, ew ro ramitena na raye wezeno, reye dîrokê xo di, çandî xo di niyado hona caye xo bîjero. Hora ki derdê xo alewiyyey niyo, riyê xo xive nêsanoy. Qe nî dîrokê alewiyyey ri neqîn mekero. Keso ki wazeno ra-

ye xo biramo gerekî kirmancena xo ri ki wayîr biveciyo. Bizano ki keso ki welatê xo ra vişiya şarê xo ra biriya ne, raya xo maneno ne ki name xo. Çi ki bindê baweriyê xo, welatî xo dero. Onca jiyar diyarê xo û ewliyyeyî xo tê di, welatê xo derî. Ew ro alewiyyê kurd her kes ra zaf axme biyî û her ju welatê ser pere ra şiyî. Hora ki nêwazenî werte şaranê bînan di vînd bî şerî, çiqas ki raye xo ri wayiriyê kenê, di hondi ki kirmancena xo ri ki wayiriyê bikerî. Birayê xoyî ki xoserîna kurd sero danê pêro, rinda rind leyî înan di ca bî.

Hora zilm, qe alewî ser kem nêbî. Bizaniyo ew ro fersendê dîrokî kewto alewî dest. Mordemo kurd, alewiyyê xo, şafîiyî xo, yezdaniyyî xo ew ro biyî hast, xoserîna xo ser biyî ju. Alewî ew ro teyna niyo. Bizaniyo hora ki sarewardayena kurd ki ser nêkuyo îbadetxaneyî ki ew ro yenî diyar, meşthe riznen sare alewiyan. Naye di alewiyyê tirk ki dîrokî xo, xo vîra mekerî. Leye zalim di nî, mazlum di caye xo bicerî. Dîrokî di ki niyadiya tima alewiyyê kurd û tirk veri zaliman di poşt de ra jumîni. Zanîno ki 1937-38 di taye alewiyyê tirk poşt day şarê Dêrsîmî. Ci ra taye xo şehîd bî. Ew ro xo serîna kurdan xo serîna tirkano ki. Şaranê ma ri dismenên nî birayan lazim o. Na ki xeyretê şaranê ma ra, ebi zafey ki şarê tirk ra beno. Waxtê xo yo ki xeyreti kurd bi tirk ju bo.

Qeseyê mi yi peyên nayî ki, çiqas taye kêş wazenê ki alewiyyey poştdariya dewletê kerî, bawer ken kişarî ma ebi zafey hasari xo yo. No ki bizaniyo onca taye keş ma ra birîni ra. Kelî jî ramani kemalîsten ra bo, mal milkê, maqamê dewlethe ser bo, keşhe ki her çiyî xo ra vêrd şarê xo ra dîr vîndenî. Hora keso ki hasaro, leye şarê xo di caye xo gureto û cen xeyretî xo serinî şarê xo kênî. Onca keso ki hasaro xeyret kero ki sola şarê xo wayîrê zaney bo. Xo ri wayiriyê bikero û rozê onca welatê xo di bicuyo. Zanemê ki herkes xesreta welatê xo enceno. Koye ma jiyar, diyarê ma bhegur mendî. Bizanî çimhe kalîkanê ma rayê ma di perê. Bizanî xelasa şarê ma dîr niyo.

H. ANAVAR

# Çira pêncan

**Çira Pêncan, kurteçiroka Fewaz Evdî ye û di pêşbaziya Koma Xanî ya Çand û Wêjeyê de xelata duyemîntiyê standiye. Encama pêşbaziya di 3'ê tîrmeha 1995'an de li Helebê diyar bûbû. Di vê pêşbaziya kurteçirokan de Suut Kılıç xelata yekemîntiyê wer-girtibû û me ew weşandibû. Niha jî em vê kurteçirokê pêşkêşî dêhna we dikin.**

"Diyarî canê tembûra M. Şêxo"

Li gasîna Mehabadê, Çarçira li hev civiyan û wekî her şev, gilî û gazinên xwe bi hev dikirin. Yekê ji wan ji xwehên xwe re digot:  
- Ma ta kengê emê wiha bin?!  
- Çima? Ma çî bi me hatiye? Xweha wê lê ve-gerand.  
- Ma çî bi me nehatiye.. Ji çaxê ku, tê bîra min, em her çar in.. Ne em kesî dibînin û ne kes me dibîne.. Her şev emê her çar beramberî hev rûnin û li riwên hev binêrin... Bes e, em dilsar-

bûn..  
- Û çî bi destê me tê? Ya sisiyan derbasî axaftinê bû.  
- Gasîna çarçira/ ya duduwan got/ Va gasîna Mehabatê jî bû bi navê me... Ma hûn çî dixwazin!?  
- Çî bi destê me tê!! ya yekem got. Gasîn bû bi navê me û dûv re!? Ta kengî emê her çar bi tenê bin? Em li vir daleqandin û piştî xwe dane me. Roj dibuhirin, sal dibuhirin û roj bi roj emê bîn ji bîrkin..  
Çira sisiyan da xwe ku rabe, lê serê wê li darê ku pêve daleqandî ket. Bi xeyd got: "Hooh!

Hûn nahêlin em şevêkê bi kêfxweşî derbas bikin û ne hûn dihêlin em dilxweş xew kin! Berê xwe da ya yekem- Û tu, ta kengî tê wiha bêhêvî bî û dilê me sar bikî? Li ya çara zîvirî- Çima tu bêdengî xwehê! Tu jî gotinekê bêjî..  
Çira çara (ya ku bêdengbû û jî tevan bi ronîtir bû) serê xwe rakir û bi giranî ji wan re got:  
-Yê em daleqandin me jî bîr nake... Lê dilê min ji min re dibêje ku wê mêvaneke me bê.  
Bi vê gotinê re, axaftinê rêçikeke din girt. Rêçika hatin û nehatina mêvan.. Lê herçaran, di

dilê xwe de, hêvî dikirin, ku rast be..  
Berî şevbihêrka wan belav bibe, çirak di gasî-nê de veket. Axaftin qut bû. Her çar bi hev re lê civiyan û bi xêrhatinê dan.. Rê nedidan hev, her yekê dixwest ku berî ya din pirsekê bike û çiroka wê bizane..  
Mêvana wan hêsirên xwe paqij kirin. Bi wan bişirî û çiroka xwe ji wan re got:  
- Ez yara dengbêjekî bûm. Rojekê ji rojên zivistanê me hev naskir û jî wê rojê ve ta firo em bi hev re man.. Min gelek serêşî jê re peyda kir. Heke ku em bi hev re di-

tibûna, wê ew bigirtana û îşkence û lêdan lê kirana... Carekê piştî girtinê, min dît du hevalên wî ketine bin çengê wî û ew anîn mal. Min nivîn jê re danîn. Piştî ket nav nivînê, min goreya wî ji nig dextist, çermê nig pê re hat... Qarîn ji min çû, lê ew bişirî û dilê min xweş kir ku tu êşa gelek lê tune.. Bi şevan ez û ew li gundan veşartî man, lê me newêribû xwe li Xecokê veşêrin, ji ber ku di destpêkê de diçûn wir li me dipirsîn... Çiqasî bi-êşiya ku êvarî em bi tenê diman, li min dinêrî û dikeniya. Lê ku destê min digirt, kul û derdên xwe bi stranî diherikandin. Gelek caran hêsirî çavên wî diherikîn û carina borîna giriyê wî bilind dibû. Digot: "Şerm e mêr bigirî, ne wiha ye!" Lê ez û tu bûne canek, jî vê yekê ez li pêş te digirîm, ji ber ez dizanim, ku tu vî razî eşkera nakî."  
Min serî, bi erêfî, jê re dihejand.  
Şevêkê jî şevên zivistanê, di salekê jî van salan de hat ez hilgirtim û meşî... Di bin baranê de, ez binçeng kirim da ez şil nebim. Sinor derbas-kin û ez pê re. Ji Qamişloke em reviyam. Em hatin Mehabadê..  
Şeva çuyî min bi saz û wî bi stran, me şevbihêr-keke stranî li dar xist. Piştî em veşêrin mal -û mala me jî bi nav mal: Odeke biçûk e, ji bindar-kekê û mitêlekê pê ve lê tune- ba û bablîsokeke xurt rabû. Xwe li ser bindarkê veheşand. Min xwest di ber de rakevim, lê wî nehişt, ditirsiya, ku parsiwên min bişkin... Ji vê yekê, bi takî ez bi dî-wêr ve daleqandim...  
Jêrenot: Ev bawerî ji dora Gimgimê hatine berhevkirin.  
JÊHAT GIMGIM

## Dilopek ji baweriyên civakî

Civaka kurdan civa-keke girtî ye. Beriya Şerê Azadiyê tev girtibû. Ji ber koçberî û mişextiyê hinek guherandin ji hêla neyînî ve çêbûbûn.  
Ji ber ku Kurdistan bindest bû, bi tore û jiyana xwe ya girtî xwe diparast. Lê êdî kurd bi xwe bawer in û piştî xwe jî zexim kirine. Divê mirov dev ji adet û toreyê bêkêr ber de, xwe bi azadiya xwe re nû bike.  
Ev bawerî û ceribên ez li jêr rêz dikim, didin xuyandî ku kurdan xwe, tebîet û cografya xwe, jiyana xwe ya dîrokî, di çanda xwe de hecî-qandine.

kevok bêyom e. Zûrandina kûçik nûçeyê tiştên xerabe ye.

**Li ser parêzandinê**  
Tê bawerkin ku koma kûçikan êrişê ser mirov bikin mirov tûnbide (rûniştibe) nêzikî mirov nabin. Hirç jî êrişî ser mirov bike, mirov xwe tazî bike, destî mirov nabe.

**Jin**  
Jin bi qedr û rûmet in. Di şeran de jinan desmal biavêta ber lingê zilaman, zilam neçarê rawestîne bûn. Zilamê jinan leşkerî biqedanda kirasê xwe diçirandin. Di meha rêbendanê de her rojek bi navê pîrejî-neke bî dihat binavkirin.

**Nexweşî**  
Kûçikê diranan bisîqî-rîne an jî girêz ji dev de



Li gorî baweriyên kurdan agirê binê şîr jî nayê dayîn.

biherike ew kûçik qidûz e.  
Yekî/ê bi zerikê bike-ta mîza birayê wî/ê ye biçûk bi tev xweşavê didanê.

Bizmarê bi jeng di canê mirov de biçûya, bi text û daran lêdîdan.  
Birîn teşenekî bibûya pîso-pîşo (paçê şewitandî) didan ser, rûn

diqijilandin beredidan ser birînê  
Jêrenot: Ev bawerî ji dora Gimgimê hatine berhevkirin.  
JÊHAT GIMGIM

**Li ser heywanan**  
Di baweriyên kurdan de heywanên bêyom û biyom hene. Wekî ker oxir e, pisîk bêoxirî ye,



## Nûdema Payizê

Kovara Hunerî, Edebî û Çandî Nûdem, hej-mara xwe ya payizê (hejmara 15) derxist.  
Di vê hejmarê de nivîsek dîr û dirêj li ser Mîr Kamûran Bedir-Xan ji aliyê Rojan Hazim ve hatiye amadekirin. Li ser vê yekê Edîtorê Nûdemê der barê girîngiya vê meseleyê de wê dibêje: "Di sala 1993'an de sedsaliya bûyîna Celadet Bedir-Xan bû. Îsal jî sedsaliya bûyîna birayê wî ye biçûk Kamiran Bedir-Xan e. Her-tim mîna ku Kamiran Bedir-Xan di siya Celadet Bedir-Xan de hatibe jîbîrkin. Bi hinceta bîranîna Kamiran Bedir Beg, min di tu kovar û rojnameyên kurdan de tiştêk nexwend, tu nû-çe nebihîst, tu çalakî nedît. ...Bêguman wê her tim cihekî wî ye taybet di dîroka rewşenbîriya kurdî de hebe."  
Ji hêla din nivîsek Felat Dilgeş a lêkolînî li

ser "Ehmedê Xanî û Ramana Dewletî" û yek Îngmar Karlsson li ser "Êzîdiyên Çiyayê Sincarê" heye. Di eynî hejmarê de nivîsa Süleyman Demir li ser rewşenbîrên Rûsan, "Demekê ku hate kuştin" û ya Şerefxan Cizirî li ser "Galîleo Galîlei", hene. Ji xeynî van nivîsên lêkolînî, helbestên Rojen Barnas, Mehîfûz Mayî, Can Gülşenoğlu, Merwanê Keleş, M. Emîn Pencewîni, Hoşeng Biroka hene.  
Di hejmara Nûdemê ya payizî de çîrokeke Firat Cewerî, "Romanseke Çilmîsî" û çîrokeke nivîskarê tirk Aziz Nesin, "Hişê xwe pêş de bibin" ji aliyê Mustafa Aydoğan hatiye wergerandin, hene. Ji xeynî van nivîsan Xelîl Duhokî, Şefîk Kaya, Lokman Polat, Sabah Kara bi nivîsên xwe beşdarî vê hejmarê bûne.  
Servîsa Çandê

Spîde çend keç û xort hatin ew pîrozkirin, ji bo serkeftina şevbihêrkê. Çavê yekî ji wan bi min ket, bezîn bi min ve, xwestin dermanekî ji min re bînin, çareyekê bibînin, lê wî nehişt, êdî ber bi min ve hat, bi destê xwe perçên min kom kirin û xistin tûrikekî spî û di ber re ji wan re digot:  
- Kes dest nedê... Ezê tembûra xwe li kêleka Qazî Mihemed veşêrim..  
FEWAZ EVDÎ

# Festîvala Fîlman a Venedîkê ket 52 saliya xwe



**Di Festîvala Venedîk a 52'an de rejîsorê ku balê dikşîne ser xwe, Michelangelo Antonioni yê 81 Salî ye. Filmê wî ku bi alîkariya rejîsor Wim Wenders çêkiriye, Par-dela les Nuages, (Li paş Ewran) jî aliyê serokkomarê Îtalya Oscar Luigi Scalfaro jî hate seyrkirin. Li gorî çavdêrên ku festîvalê dişopînin, Antonioni bi vî filmê xwe mohra xwe jî wê li festîvalê bixîne.**

tikvanê bi nav û deng Kevin Costner ve hatiye çêkirin ( di film de ew wekî listikvanê yekemîn e jî) wekî filmên Hollywood, balê dikşîne ser xwe. Festîval, bi filmê rejîsor Tony Scott, "Crimson Tide" hate vekirin. Ev film di bin avê de di noqarekê (keştiya bin avê) de derbas dibe.

Di festîvalê de rejîsorê ku balê dikşîne ser xwe, Michelangelo Antonioni yê 81 salî ye. Filmê wî ku bi alîkariya rejîsor Wim Wenders çêkiriye, Par-dela les Nuages, (Li paş Ewran) jî aliyê Serokkomarê Îtalya Oscar Luigi Scalfaro jî hate seyrkirin. Li gorî çavdêrên ku festîvalê dişopînin, Antonioni bi vî filmê xwe mohra xwe jî wê li festîvalê bixîne.

Par-dela les Nuages, wekî filmê hosta Antonioni yê wasiyetê tê nixandin. Babeta film, li ser rasthatin û pêrgînê ye. Ev rasthatinên ku her dem mirov dixê nav hisên kûr, davêje nav surprîzan, tirsên nayên texmînkirin û rasthatinên ku mirovan ber bi xeman da. Bi kurtî film qala tîkiliya

nav jin û mêran dike, ew tîkiliyên ku dibe sebebên bêtîkiliyan, dibe sebebê îxanet û xapandinan....

Di festîvala Venedîkê ya îsal de filmên ku di Kevin musabaqayê yê din, ev in. In The Bleak Midwinter/ Kenneth Branagh (Îngilîstan), Sin Remitente/ Carlos Carrera (Meksîka), La Cere monie/ Claude Chabral (Fransa), Pasolini:Un Delitto Italiano/ Marco Tullio Giordana (Îtalya), Guantanamo/ T. Gutierrez Alea- Jean Carlos T. Rey (Kûba), Der Totmacher/ Romuayd Kartmakar (Almanya), Mabori No Hikari/ Hirokazu Koreeda (Japonya), Clockers/ Spike Lee (Dewletên Yekbûyî Amerîka- DYA), A Comedia de Cardiogramma/ Darezhan Omirbayev (Qazakîstan), The Crossing Guard/ Sean Penn (DYA), Romen Gi ovane Povero/ Ettore Scola (Îtalya), De Vliegende Hollander/ Jos Stelling (Hollanda-Belçîka), L'uomo delle Stelle/ Giuseppe Tornatore (Îtalya), Cyclo/ Tran Ang Hung (Wîetnam-Fransa), Nothing Personal/ Thaddeus O'Sullivan (Îrlanda).

Li hêla din hinek rejîsorên jî nexwestin beşdarî festîvalê bibin. Rejîsorên ku bi filmên xwe yê nû beşdarî festîvalê nebûne, ev in: Martin Scorsese, Stephen Frears, û Clint Eastwood  
**SUUT KILIÇ**

Ev 52 sal e ku li bajarê Îtalya yê bi nav û deng Venedîkê, festîvala fîlman tê çêkirin. Li hemû dinyayê ev organîzasyon, xwedî sewiyê û navekî ye. Îsal, festîvala 52'an tê lidarxistin. Di serê hefteya borîn

de bi beşdariya 16 fîlman, festîvalê dest pê kir. Wek salên çûyî îsal jî organîzasyona festîvalê, li hemberî sînemaya Amerîkayê kota danî. Di festîvala îsal de filmê Amerîkî "Waterworld" (Avdinya) ku jî aliyê lis-

de bi beşdariya 16 fîlman, festîvalê dest pê kir. Wek salên çûyî îsal jî organîzasyona festîvalê, li hemberî sînemaya Amerîkayê kota danî. Di festîvala îsal de filmê Amerîkî "Waterworld" (Avdinya) ku jî aliyê lis-

## REWEZ

### Mîwanêkî nawexit

Ey cestey pir rêjney evîn,  
Le reşmalî çawekanta,  
Ez mîwanêkî nawext bûm,  
Min ew rêbware siste bûm, direng geyîştîme zîney çawanit.

To rast defermûyit; direng hatî..  
Direng hatim, êdî boçî gazinî to û gazin xom,  
Edem be kolî eşq im da,  
Ez kure germiyaniyekî nabeld bûm,  
Salehayê le mûkiryani eşiq da gûzer dekem,  
Keçî... Be rêbwarîş lam nedaye ser kanyawî çawî sablax.

Be rêbwarîş aşiq bûmaye, her wabestey ebedî debûm û

Tînûyetî huetayim deşka.  
Ey sablaxî eşq û evîn;  
Êsta... Aşiqêkî hejarî tom..  
Zor be hêminî le mîhrabî çawekanta desûtêm.

Desûtêm û kes gwêy le qirçey cergî evîn im  
Niye û niye û niye....  
Kot û kelepçey neritî kevnara,  
Le meçekta bûne bazinî rengawreng.  
Paytextî eşqî mûkiryani im.  
Min mîwanêkî direng wext im.  
Eger daldeşim nedey, natwanim bilêm lel  
Lê belê ez dezanim "lay sexî teban mehale rûxsetî mîwanî şew"

Min le şewî eşqî to da be cê maw im.  
Tarîkistanî tûş û rehêlem be ser da hatuwe û na be cê maw im.  
Gemî sewda le zeryay reşî çawanta,  
hezî le semay şadî ye.

Dexwazî û naxwazî:  
Keştî dilim le benderî çawekanta lenger bigrê. Dexwazî:

Bîren cênî û neyrencênî-  
Min gileyim le to niye.. Direng hatim.  
Katê hatim le deryay ew çawanet da,  
Yekêkî tir meley dekird.  
Ciwanûy evîn be korjin bû, kanî çawantî tey dekird-  
Zor tînu bû, belam, belam ew kanî ber tirîfeye.

Yekêkî tir bînî hezî pêwe nabû.  
Îdî çibikem.. Çi?  
Niha jî, le minarey deşt û kêw da bangî xoşewîst im dedem:  
Xoş im dewêy.. Lê ji ber ku min direng hatim û  
Direng çawim be şanoy çawanî to kewit, awazî  
Sitranekey min "Xoşim dewêy".. Zû zimanî hezû xûlyay le go dextrêt.

Îdî ewe çarenûsî eşqî min bû  
Direng hatim.. Direng, direng.  
Henûke min û to, dû kêlî terîbîn û nageyin be yek.

Zû tir negeyştîm, pencem lew pence şimşalyane bialênim û be soztîrîn neway hez û tase bixemlênim.  
Bimbexşe.. min mîwanêkî nawext im le malî xoşewîstîfî da,

Min mîwanêkî nawext im.  
Min aşiqêkî bê bext im.

SÎRWAN REHÎM

**Dimenek ji filmê rejîsor Claude Chabrolê ku yek ji nûnerê Pâla Nû ye tê ditin. Di vî filmî de Sandrine Bonnaire di listikvaniya xwe de digihîje zirveyê.**



# Dibistan û TV'ya MED'ê

**B**erî vebûna dibistanan bi çend rojan, Ferhad û hevalên xwe Hemo, Weysî û Zeynê, li kuçê, li bin dîwêr rûdin û ji xwe re dipeyivin. Ferhad bi xwe ji Amedê ye û li dibistana navîn xwendevanê pola (sinifa) duymîn e. Ferhad û hevalên xwe, li ser bêhnvedana havînê dest bi sohbetê dikin. De em guhên xwe bidine axaftina wan bê ka ji hev re behsa çî dikin:

**Weysî:** "Min havîna xwe li Gola Hezarê derbas kir. Gelekî xweş bû. Min berê avjenî nedizani, li vir min xwe hînî avjeniyê kir."

**Ferhad:** "Ê min, ez neçûm derekê jî. Ez li Amedê mam û min her şev li Televizyona MED'ê temaşe dikir."

**Zeynê:** "Min Televizyonek bi vî navî nebihîstiyê. Gelo ev çî televizyon e, ma kenaleke wisa heye?"

**Ferhad:** "Erê heye. Ew televizyona me kurdan e. Çend heyv berê dest bi weşana xwe kir."

**Zeynê:** "Çî programan nîşan dide?"

**Ferhad:** "Her êvar sa-



et di heftan de, bi program "Rojbaş Mamosta" dest pê dike û di dehan de jî dawî lê tê. Di vê programê de, mamoste dersên zimanê kurdî di-

de. Mamoste mirovekî cirweş û zar şêrîn e. Deh şagirtên wî jî hene. Bi nermikayî û bi xweşkayî şagirtên xwe hînî xwendin û nivîsînê dike.

Di destên wî de darik tune û wekî mamosteyên me li zarokan naxe. Şagirtên wî jî bersivên xwe ji cihên xwe bi serbestî didin. Heger

yek ji wan bersiva rast bide, yê din jî jê re çepikan lê didin. Heger bersiv çewt be jî, mamoste careke din nîşanî wan dide. Hevalino, te-

levizyona MED'ê bi van antenan nakişîne, bi antena peykê dikişîne."

**Hemo:** "Baş e Ferhad, tu jî, ji televizyonê hînî xwendin û nivîsînê bûyî?"

**Ferhad:** "Belê, lê ne gelek. Lê ezê bi pêş ve bibim. Jixwe ez û bavê xwe em bi hev re hînî dibin."

**Weysî:** (Hinekî ji vê babetê zivêr bibû) Tu hema li ser zimên dipeyivî. Ma di vê tv'yê de tişteki dîtir tune?

**Ferhad:** "Belê, gelek tiştên din hene. Bi Xwedê televizyona MED'ê gelekî xweş e. Tê de filmên zarokan dilîzin, stran tene gotin, berebziyên biçûk û mezinan jî hene. Gerîla jî tê de derdikevin. Hûn jî ji bavên xwe re bibêjin bila antena televizyona MED'ê bikin da em di demeke kurt de hînî xwendin û nivîsîna zimanê xwe bibin. Bi xwedê..."

Hîna axaftina zarokan dom dikir, gotina bavê Ferhad hate bîra wî. Ji ber vê yekê Ferhad xatir ji hevalên xwe xwest û rabû çû.

DILAWER

## D Î T Î N Û R A M A N

### Em zarokên xwe hînî kurdî bikin

**D**ijminên gelê kurd bi taybetî piştî şerê parvekirina Dinyayê yê Yekemîn, bi bavên xwe yê împeryalist re xwestin ku Kurdistanê jî kurdan vala bikin û gelê kurd bi temamî ji holê rakin. Lê belê piştî vî siyaseta qirêj ku ev nêzî heftê salî ye li ser kurdan tê meşandin, îro ne Kurdistan ji kurdan vala ye, ne jî gelê kurd ji holê rabûye. Dijminên gelê kurd bi taybetî xwestiyê ku vî siyaseta xwe ya qirêj ji hêla asimilekirina çand û ziman ve li ser kurdan pêk bînin û bi vî armancê jî, bi her riyê êrîşên xwe li ser kurdan meşandine. Ji ber van êrîşên nijadpe-rest gelê kurd ji çand û zimanê xwe gelek tişt winda kirine. Ev windarîrin hê jî didome. Tiştê ku ji ber hemû koçberkirin û

qetlîaman ve nekarin ji kurdan bistînin, îro bi rîya asimilasyonê ve hêdî hêdî distînin.

Îro em bala xwe didinê ku êdî bi piranî kurdên bajarên bi zarokên xwe re bi tirkî dipeyivin. Mirov dinêre ku di malekê de nevî û bapîr bi hevdu re nikarin bipeyivin. Lewre bav û dayikên wan zimanê xwe yê zikmakî jî bi wan hîn nekirine. Em pir caran lê rast tînin, her wekî qebehetekê ye ku dê û bavên zarokan bi wan re kurdî napeyivin. Hinek kes jî hene dibê qey ku zarokên wan kurdî nizanibin ewê pê mezin bibin. Lê belê ev kes nizanin esil biçûkayî ew e ku zarokê mirovan nizanibe bi diya mirov re bipeyive û zarokên mirov wekî zarokên biyaniyan, xerîbî dê û bavê mirov be, çanda mirov û koka mirov nasneke.

Em dibînin ku îro dijminên gelê kurd êdî hemû hacetên teknîkî li ser kurdan bi kar tînin ku zimanê kurdan asimilê bikin. Bi bîstan radyo, tv û rojname û dibistanên xwe ve, li derve, li mal, li

her der û demê, bi çand û bi zimanê xwe di jiyana me de ne. Dikin ku bi me kurdan roj bi roj çand û zimanê me bidin jibîrkirin û me di nav çanda xwe ya gemar de bidin helandin.

Ma divê ku em kurd jî alî dijminê xwe bikin? Ma divê tiştê ku bi hezar zilm û zordariyê nikarin li ser me pêk bînin, em wî tiştî di mala xwe de pêk bînin? Na...naaa!. Divê însanên kurd ên xwe naskirî neyêne vî fenê. Divê berî her tiştî ev însanên kurd zimanê kurdî hînî zarokên xwe bikin.

Gerek em vî tiştî baş bizanibin ku, zimanê miletekî dema bimire ew millet jî pê re dimire. Jiyan û kesîtiya milletê xwe, divê ku em zimanê xwe û çanda xwe di her aliyê jiyana xwe da bidin jiyandin.

Ev jî, ji bo me kurdan wezîfeyeke pir girîng e. Ger em vî wezîfeyê pêk neynin, em dibin şîrîkê sûcên dijminê xwe.

MIRAZ RONÎ

### Deng, çiya û ziman

**D**eng, li gorî jiyana û hilberîniyê pêk tê. Mirov çiqas dengên biyan bi kar bîne, ewqas ji zimanê xwe yê zikmakî û xwerû dîr dikeve. Di vî watîniyê de dema mirov li Kurdisanê dinihêre xuya dibe ku kîjan devera Kurdistanê bêhtir di binê bandora dijminan de maye û ji zimanê xwe dîr ketiye. Kurdên ku li berî û deştan dijîn, ên ku di sînorên dagirkeran de xwedî cih û war in, ên ku di bajarên dagirkeran de dijîn pir ketine binê bendora zimanên biyan. Ji ber ku dengên biyan bi kar tînin, zimanê wan, ne zimanekî fesîh e. Mînak: Dengên (ê) û (h) wekî dengên erebî, li şûna (x) yê jî, (g) ya tirkî bi kar tînin. Wekî di her alî de, ji aliyê ziman ve jî kurdên ku li çiya dijîn bêhtir

zimanê xwe yê xwerû bi kar tînin. Lewre tîkiliya wan û dijminan lawaz (zeîf) maye. Her wiha li gorî jiyana çiya jî zimanê li çiya tê bi kar anîn, zimanekî fesîh e, sivik e.

Tiştêkî diyar e ku di zimanê rojane de, bi piranî nav tene bikaranîn, mixabin em dinihêrin navên însanên kurd, ji sedî not (ji bilî navên ku di van deh salên dawî de hatine lêkirin) biyan in bi ser de jî em ji tirkî werdigerînin û dengên jî wekî tirkî bi kar tînin.

Ne Abdurrahman e, li gorî dengên kurdî divê Evidrehman be. Ne Xetîce û Hatîce ye, li gorî dengên kurdî divê Xecê be. Mirov çiqas li eslê xwe xwedî derkeve ewqas, li zimanê xwe xwedî derdikeve. Em dibînin ku welatê me çiqas ber bi azadiyê ve diçe zimanê me jî ewqas derdikeve ronahiyê.

Divê mirov di warê ziman de jî bi bizav û bi rîjd be. Her wiha mirov di jiyana xwe de bi kurdî hez bike, bi kurdî bîlorîne, bi kurdî bistrê û bi kurdî çêran bike.

Li vir du pêşniyazên

min hene, yek ji xwendevanan re ye. Divê xwendevan zimanê nivîskî di qîse û peyvînan de bi kar bînin. Ne wisa be wê zimanê rojane (devkî) û zimanê nivîskî her here ji hevdu dîr bikevin. Pêşniyaza din jî ji Welatê Me re ye. Ger Welatê Me cih bide rêzimanîyê wê bêhtir bikelk be. Her çiqas Welatê Me rojname be jî, diyar e ku gelê me ji her alî ve ji rojnameyê hin hêvî û daxwazan jê dike. Li ser çewtiyên bikaranîna ziman, pêkenokê heye; dixwazim pêşkêşî xwendevanan bikim.

Conegayê Sarê winda dibe. Sarê, gava ku li conega digere dibîne ku Xalê Emer li ber çem destnimêjê digire. Bangî Xalê Emer dike:

-Xalê Emer! Te boxeyê me nedîtiye?

Xalê Emer ji kerba vî çewtiyê, wiha bersivê dide:

-Were Sara min, boxe ez im. Bûûûû!

Piştî ku hêrsa Xalê Emer dadikeve, gazî Sarê dike û dibêje:

-Qîza min, ma tu nizanî bibêjî conega...

JÊHAT GIMGIM

Afirînerên destanên kurdî; Amîna Memê Alan, Siyabend û Xecê, Ker û Kulik, Binevşa Narîn û Cembeliyê Kurê Mirê Hekariyan û... Xwediyên dengên zîz û zengilî. Şênahiya civat û şevbihêrkên zivistanê...

Dengbêj, ji berê de bi aliyan dêhna min kişandine. Yek, destanên wan, lawik û dūrikên wan bi tevî naveroka wan ve, dudo, hunera wan a bikaranîna deng.

Li ser naveroka berhemên wan, yekser ez vê bibêjim: Serhildanên kurdan ez ji wan hîn bûm. Dikarim bibêjim ku ez bi saya wan bi kurdûna xwe jî hesiyam. Beriya ku ez der barê serhildana Şêx Seîd, Çiyayê Agirî û yên din de tiştek bixwînim, min ew, ji kilamên dengêjan bihîstin. Kilamên li ser Şêx Fexrî, Mela Usivê Seydo, Mala Eliyê Unis, Şêx Mîzbeh... hîn di bîra min de ne û bandora wan a li ser min,



## Homerosên me kurdan: Dengbêj

li gorî berhemên nivîskî bêhtir e.

Ew ne bi tenê ji bûyer û qewmînen demên nêzik behs dikin. Ew rêwiyên dîrokê ne û ji kûraniya wê tî. Li ser her celeb bûyerî rawestiyane û ew honavine. Ji evîne heta bi şerê kurdan ên bixwebixweyî û serhildanên wan ên li dijî biyaniyan, mijarên destan û kilamên wan in. Bi kurtî em raboriya xwe di berhemên wan de dibînin, ew neynikên civata me ne. Ji bo grekiyan Homeros çi be, dengbêjên me jî ji bo me ew in. Kî dikare Evdalê Zeynikê û gelek kesên

din bi bîr neyne, wan ji bîr bike?

Heke em li ser hêla teknîka bikaranîna deng ên dengbêjan jî rawestin: Baş tê zanîn ku bi gelemperî destanên kurdî hem bi gotin û hem jî bi awaz (melodî) tî vegotin. Ev jî taybetiyeke destanên kurdî û dengbêjan e. Ew destanên ku me navên wan li jorê dan hemû wisan in.

Ev dengbêj ji aliyê bikaranîna deng ve şaraza ne. Em dikarin bi vî awayî li ser taybetiya wan a deng bisekin: 1-Xweş deng bi kar tînin

- 2-Pir bi hêsani henasê (nefesê) didin û distînin
- 3-Bi awayekî paqij distrên
- 4-Dengêkî paqij û rewan derdixin

Dibe ku bala gelekên jî kişandibe. Gava ku dengbêj distrên, destekî xwe dibine ber guhê xwe û tiliya xwe ya îşaretê jî dikine kerika guhê xwe. Pişt re qîr dikin, lawika xwe, dūrika xwe... dibêjin. A bi vî tevgera xwe, ew bi xwe jî dengên xwe guhdarî dikin û wî kontrol dikin. Bi rojan distîrên, dengên wan nakeve. Bêsaz û amûrên (haletên) muzîkê hunerên xwe pêşkêş dikin. Hinek ji dengê serî distrên, hinek jî, ji diaframa xwe.

Divê dengbêjî û stranbêjî jî neyên tevîhevkerin. Ev du tiştên cuda ne. Di dawiyê de em vê jî bibêjin ku, tevgera azadiyê pir-hindik stranbêjên xwe afirandine, lê dengbêjên xwe na.

Ji bo avêjtina hindêk pêngavên mukum di havîna pêrar (1993) de, biryarek hatibû dan ku li bin çavdêriya koma miletan, bi pişikdariya nûnerên DYA û Britanyayê û bi mêvandariya hikûmeta Frensayê, wê di 16-17 reşemiyê (şubata) 1994 an de, li navbera YNK û PDK'ê kombûnek hatibûna saz kirin. Ev kombûna ku li ser daxwaza Frensayê wê pêk hatibûna, diviya ku gelekî 'nihênî' bûna. Li dūv dezgahên ragihandina YNK'ê, (Kurdistanî Nwê, Dengî Gelî Kurdistan, di heyvên reşemî û adarê de) ji ber neçûna Mesûdê Barzanî ev

kombûn pêk nayê û li ser vê çendê, di bin navê 'şerê li ser dikana' de, yekemîn cenga xwe ji devera Ranya û Qeladizê dest pê dikin. Lê ev şerê wan, bi navgîniya dewletên hevpeyman, di demeke kurt de tê rawestandî û kombûna heyva reşemiyê di heyva gulanê de tê destnîşankirin. Biryarên ku di vê kombûnê de wê hatibûna standin, li dūv daxuyakirina Endamê Politburoya YNK'ê Nûşîrwan Mistefa (Televizyona Gelî Kurdistan çavpêkef-

## Teyrê maqûl

tin), li bin çavdêriya Koma Miletan:

1- Heljimartineke bi rêk û pêk.

2- Helbijartin wê hatibûna kirin.

Helbet, hikûmeta ku wê ji vê helbijartinê derkeve, ji ber ku li bin çavdêriya Koma Miletan hatiye kirin, di nêrîna cîhanê de wê resmîyetek jî jê re hebûna. Bi rastî wê hingê dewleta tirkî ji ber vê kombûnê xwe gelekî tengav didît û di her keys û delîveyê de li hemberî vê kombûnê nerazibûna xwe diyar dikir.

Dîsa li dūv daxuyakirina Nûşîrwan Mistefa, li roja piştî kombûnê, angopiştî vegera Nûnerê PDK'ê Sefîn Dizeyî bo Enqereyê; biryarên vê kombûna ku diviya 'nihênî' bimîne, di hemû dezgahên ragihandina tirkî de hatin weşandin! Ji ber vê yekê, çî di hevpeyvîna xwe ya digel Kurdistanî Nwê û çî jî di çavpêkeftina xwe ya digel televizyona Gelî Kurdistan de, Nûşîrwan Mistefa piştî axaftineke dūr û dirêj wisa dibêje: "Êdî em hew dikarin bi vî partiyê (PDK) re bi-

meşin. Divê ev partî bi-be teyrekî maqûl" û her wisa duwemîn cenga wan binavê 'Şerê li Ser Gumrikê' dest pê dîke. Li vir, pirsek me ji rêzdar Nûşîrwan Mistefa heye.

Erê baş e Kak Nûşîrwan, Piştî kombûna Dublinê ya gelekî 'nihênî!', YNK, yan partî (PDK), gelo kîjan ji van bûye teyrekî maqûl?. Cara din (kombûna Parisê) Sefîn Dizeyî bi 'nihênî' kir. Lê vî carê; ji bilî amadebûna nûnerê tirkî, 'lehengê Komatê!' Kak Samî bi rojan û li Enqerê bi 'nermî' kir!

DILDAR ŞEKO

## FERHENGOK

**Amoza (sorani):** Pismam, dotmam  
**Bîrewer:** Kesê bîrbir, (bilge)  
**Bîrewerî:** Bîranîn, bîrbirin.  
**Bêhnvedan:** Vehes, mola, istirahat  
**Dilovan:** Kesê dilnêrm, rehman  
**Dunde:** War, zuriyet  
**Hevpeyman:** Hevsoz, tehalif,  
 bi hev re  
**Hêman:** Unsûr. (Li gorî baweriya olî ya êzidiyan dinya ji çar hêmanan pêk hatiye: Agir, ax, av û hewa)  
**Kordunde:** War-reş, kesê ku zarokê wî yê kurîn nîn e  
**Lavayî:** Berger, dua. (Rozerîne pir lavayî ji Zozanê kirin.)  
**Mêvandar:** Mazûban, mirovê xwedan mêvan.  
**Navincî:** Navîn, dibistana navîn  
**Nijad:** Irq, qewm.

**Peyk:** Heyv peyka dinyayê ye. (Uydu)  
**Peyman:** Soz, ahd  
**Peyrew:** Nîzamnâme (Tüzük) (Peyrewa hundirîn a Parlemantoyê)  
**Pol:** Sinif, li dibistanê. (Rostem îsal diçe pola pêncan a dibistana navîn)  
**Rêbaz:** Manifesto, munhec.  
**Sewal:** Pez û dewarên mêşinî.  
**Seredan:** Çûna cihekî, ziyaret. (Dara çû seredana hevalê xwe Mîrza)  
**Serenc:** Balkêşan, inzar  
**Şande:** Wefd, heyet.  
**Xêzan:** Malbat, aile.  
**Xizim:** Mirovatiya bi jinan, xinamî.  
**Zêrevan:** Pasevan, nobedar.  
**Wane:** Ders

## AGAHIYÊN ABONETIYÊ

Min Welatê Me Divê

	Li Hundir	Li Derve
<input type="checkbox"/> 6 Meh	<input type="checkbox"/> 1.000.000 TL	<input type="checkbox"/> 80 DM
<input type="checkbox"/> 12 Meh	<input type="checkbox"/> 1.800.000 TL	<input type="checkbox"/> 150 DM

Li derve buhayê rojnameyê 3 DM e.

### Bedelê Abonetiyê ez rædizînim

**Li Tirkîyê** – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti. Yapı-Kredi Parmakkapı Şubesi Hesap No: 1100264-1

**Li Derve** – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti. Yapı-Kredi Parmakkapı Şubesi Döviz Tevdiat Hesap No: 3001507-3

NAV û PAŞNAV : .....  
 NAVNİŞAN : .....

Navnîşana Welatê Me  
 Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu / İST.  
 Tel-Fax: 293 53 19 – 293 53 20

## WELATÊ ME

Rojnameya Hefteyî (Haftalık Gazete)

Li ser navê ROZA Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti. adina Xwedî (Sahibi)

Aynur BOZKURT

Heyeta Weşanê (Yayın Kurulu)

Zana FARQÎNÎ  
 Aynur BOZKURT  
 Samî TAN  
 Suut KILIÇ

Berpirsiyarê Karê Nivîsaran (Yazışleri Müdürü)

Metin AKSOY

NAVNİŞAN (Adres)  
 Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu / İSTANBUL

TEL-FAX  
 293 53 19 – 293 53 20

ÇAPXANE  
 Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

NÜNERİ (Temsilciler)  
 Çukurova- Salihê Kevirbirî 322-3597930  
 Suriye- Jan Dost Fener Rojbiyanî  
 Berlin- Silêman Sido Sîrwan Reşîd 49-30-69002695  
 Hannover- Selîm Biçûk 49-5721-81360  
 Hamburg- A.Hekim Gülsün 49-40-403388  
 Munchen- Mahmut Gergerî 49-871-670884  
 Badenwürttemberg- A. Rahîm Ayaz 49-75453258  
 Amsterdam- Cotyar Zaxoy 31-20-6130766  
 Paris- M.S. Ayçiçek 33-1-48000401  
 Atîna- Ferhan Zêbarî 30-13634905  
 Bruksel- Medenî Ferho 32-16-490767  
 Stockholm- Robîn Rewşen 46-8-7510564

# Di 1'ê Rezberê, Roja Aştiya Cîhanê de Manifestoya Aştiyê

Yaşar Kemal, Ercan Kanar, Melik Fırat, Münir Ceylan

Ji beriya bi hezaran sal ta îro, xeyaleta şer ku dijminê herî xedar ê mirovahiyê ye, her tim li ser cografyaya me digere. Tenê li welatê me di deş salên dawî de (ev şer bûye sebebê) nêzîkî bîst hezar mirî, bi hezaran gundên valakirî, bi milyonan mirovên ji axa xwe dûrxistî, daristanên şewitî, erdên çolaxbûyî... Sebeba herî girîng a buhrana birçîtî, betalî û aboriyê, ne ev şerê kirêt e ku nav lê nehatiye danîn?

Mecbûriya dawîlênanîna vî şerê ku paşeroja civaka me tehdît dike û wê dirizîne, di 1'ê Rezberê, Roja Aştiya Cîhanê de, careke din balê vedixşîne ser xwe. Şerê cîhanê yê duyemîn ê di vî roja ku faşizma Hitler êrîş biribû ser Polonyayê de dest pê kiribû, bû sebebê mirina 50 milyon însan û rûxandina qiteyan (parzemînan). Têkçûna faşizma Hitler nîşan da ku nijadperestî, dagirkerî û zordarî ne çare ye. Ev politikayên şer ku ji berê ve gelek caran li ser cografyaya me hatine ceribandin, tu car nebûne çare ji bo êş û derdên civakê. Wekî wisa ye çima ev politikayên çewt û neheq bi israr tîn domandin?

Kesên ku berjewendiyên wan di şer de ne, ji bo ku destê me bixin xeneqa hev, agirê nijadperestî û faşizmê geş dikin. Yên naxwazin ku gel bi biratî û wekhevî bi hev re bijîn, bi sloganên mîna "An jê (ji Tirkiyeyê) hez bike an jî jê derkeve" gelo dixwazin kê ji welatê kê biqewirînin?

Qêrînen mafdar ên ji

nav kesên ku di şer de şerperze bûne, êdî wê sultanên ker jî mecbûr bikin ku bibihîzin. Malbatên ku bi darê zorê zarokên wan dikevin şer jî, bi qêrîna "dewlet di rîya çewt de ye" xwe digihînin dengên malbatên kurd ên ku zarokên wan dimirin û yên ji bo kesên

ma hin mirov bi zagonên normal bîn îdarekirin, lê hin mirovên din bi yê awarte bîn cezakirin? Gelo veqetînxwaziya esas a ku bingeha bihev-rejiyîne hildiweşînin ne ev tewrên nakok in?

Mexdûrên esas ên şer jin, zarok û kal in. Şer van kesên ku garantiya

belgeyên hiqûqa navneteweyî de hatine garantîkirin. Îcar ji bo rêlibergirtina bikaranîna van mafan, em çima hev bikujîn?

Di vî rewşê de ol, cins, nijad, netewe, bawerî û nêrîna wan çi dibê bila bibê, pêwîst e wijdana çi kesên xwe

girêka kurdî bi serbestî karibin bipeyivin. Bila mafên mirovan bibin bingeha hiqûqê. Bila mirov ji ber ramanên xwe, ji ber xweifadekirinê û ji ber kirînen li gorî ramanên xwe neyên sûcdarkirin û nekevin zindanan. Em çi tiştên ji bo xwe dixwazin, ji bo kesên li

kirin. Bila rêveberiya taybet bê rakirin. Riya herî kin a lidijderketina serjêkirina mirovên me yên li welatên biyan, ew e ku em li welatê xwe cezayê îdamê ji holê rakin. Ji bo ku demek ji ya din zûtir em karibin li dijî trajediya mirovahiyê ya li Bosnayê derkevin, pêwîst e pêşî em agirê di mala xwe de bibînin, hewl bidin ku wî vemirînin û bi vî tewra xwe mîna keke erênî pêşkêşî mirovahiyê bikin. Pêwîst e em li hemberî hemû ferqumêliyên etnîk, civakî û her cure qirkirînen siyasî derkevin.

Tu tiştê ku gel li ser li hev nekin tune. Pirsgrêkê di dewletê bi xwe de, di sazî û serwestiya wê de ye. Ev rewş êdî divê biguhere. Gerek e dewlet nasname û mafên kurdan nas bike û ji bo çareseriya demokratîk gav biavêje. Paşeroja azad û bextiyar ya kurd, tirk û hemû kesên li ser van xakan dijîn, di parastina çanda jiyana hevpar, di hevnasîna û di rûmetnîşandana nasnameya hevdûn de ye.

Em ji şer û politikayên şer ên ku mirovan çepel dikin û wan ji mirovatiya wan dûr dixin re bibêjin bes e, li hember derkevin û nepejirînin.

Hêviya gelan ne şer e, demokrasiya rasteqîn e.

Em soz didin ku heta roja aştiyê emê vî qêrîna xwe bilind bikin, em her kesî vedixwînin ku beşdarî vî hawara ji bo aştiyê bibin.

WERGER:

AYNUR BOZKURT



Birek rewşenbîr (di wêne de; Ercan Kanar, Münir Ceylan û A. Melik Fırat) di 31'ê Gelawêjê de li Pera Palasê Manifestoya Aştiyê xwendin.

di girtîgehan de ne, çareya demokratîk dixwazin.

Em ji van xakan û ji yên ku li ser dijîn hez dikin. Wekî wisa ye çima tî xwestin ku ev şer bê domandin. Gelo li ser mirovahiyê têkoşîn(kirin) a li hemberî vî cenga ku gelan bi hev dide xeniqandin û hêviyan ji holê radike, ne wezîfeya me tevan e? Çima mirov nikaribin bi zimanê xwe perwerdehiyê bikin? Çi-

berdewamkirina bajarvanîyê (medeniyetê) ne, tehdît dike. Ew wan bi hilweşînen ku ne mumkûn e bîn tamîrkirin, rûbirû dihêle. Li herêma şer zarok perwerdehiyê nabînin, surgûn jî derfeta jiyana zarok, jin û kalên kê dike. Şer ji bo gelan mirin e, ji bo berjewendperestan jî tî maneya pere. Mafên bingehîn ên li ser wekhevîya gelan hatine avakirin, di

mirov dihesibînin serî hilde û tev bi hev re bibêjin "Êdî bes e", li hemberî vî politikaya şer a çewt û bizerar a ku roj bi roj me ji dirûvê mirovî dertîne.

Êdî bes e, pêwîst e ev şer biqede. Divê ev şer biqede!

Bila aliyên cengê şer rawestînin. Em wê yekê bi wan bidin kirin.

Bila em li ser çareserîkirina demokratîk a pirs-

ba xwe jî bixwazin. Em mafê wan ê jiyane, yê zimanê zikmakî, yê perwerdehiyê û yê nasnameya wan a siyasî biparêzin.

Bila êşên ku ji ber vî pirsgrêkê tîni kişandin biqedin û birîna bîn kewandin! Bila parlamento bi lezgîni dev ji politikayên xwe yê şerxwaz berde û wekî gava yekemîn a ji bo aştiyê lêborîna giştî bêşert were îlan-



Rewşenbîr di 1'ê Rezberê de li Stenbolê li Meydana Sultanahmetê ji bo aştiyê rûniştin.



Bi deş hezaran aştîxwaz di 3'ê Rezberê de li Kadıköya Stenbolê mitîngek pêk anîn û daxwaza xwe ya ji bo qedandina şer ragihandin.